
# ROJA NÛ

kovara huneri çandi û edebi



41

1995

# NAVEROK

1995 Sala Ehmedê Xani û Mem û Zin'ê ................................ 3
Hestên Xwendevanan û Labirenta Cınan - **Ehmed Tewfiq**..... 4
Rengên Gola Dokanê - **Kemal Burkay**.................................... 9
Destana Gılgamêş - **Haluk Öztürk** ......................................... 10
Mitolojiyên Mezopotamyayê - **Edward Petişka** ..................... 13
Jı bo xatırê xwendevanan - **Sigge Ågren** ................................ 16
Çend gotınên bıjarte ........................................................... 19
Feqiyê Teyra û Ava Mezın - Berhevkar: **A. Gernas**............... 20
Komela Nıviskarên Kurd lı Swêdê hat damezrandın ............. 23
Şiêr - **Ferhad Shakely**.......................................................... 24
Gera Nıviskaran lı ser Behra Reş - **Xalıt Lezgin** .................... 26
Yaşar Kemal ji kete ber êrışên dewletê ................................ 29
Berazê kûvi cara pêşın lı Kurdıstanê hatiye kedikırın ............ 31

**Sal: 16**
**Hejmar: 84, Sıbat 1995**

ISSN 0283-5355

**XWEDİ:** KOMKAR-Swêd
**BERPIRSIYAR:** Şêroyê BOTAN
**NAVNİŞAN:**Gustavslundsv.168,1 tr
161 36 STOCKHOLM
**TELEFON :** 08/ 26 23 75
**HESAP NO:** PG. 458980 - 0

**UTGIVARE:** Svensk Kurdiska Arbetarföreningen
**ANSVARIG UTGIVARE:** Ş.BOTAN
**ADRESS:** Gustavslundv. 168, 1 tr.
161 36 STOCKHOLM
**FAX:** 08/ 25 38 57
**PG:** 458980 - 0

# 1995
# SALA EHMEDÊ XANİ Û MEM Û ZİN'Ê

İSAL 300 SALİYA SALVEGERA SERTACA EDEBİYATA KURDİ MEM Û ZİN'A HOZANÊ MEZIN EHMEDÊ XANİ YE.

EHMEDÊ XANİ (1651-1707) MEM Û ZİN DI SALA 1695-AN DA NIVİSİYE



LI SER PÊŞNİYARA MEHMED EMİN BOZARSLAN GELEK RÊXISTIN Û SAZİYÊN KURDİ WÊ VÊ SALVEGERÊ BI ÇALAKİYÊN CURBECUR PİROZ BIKIN.

KOMKAR DIXWAZE BI BERNAMEYEKE FIRE WÊ PİROZ BIKE

## Jı bernama KOMKAR`ê

Yekitiya komelên Kurdıstan KOMKARê lı ser pêşniyara nıviskar M. Emin Bozarslan sala 1995`an wek "Sala Ehmedê Xani û Mem û Zin`ê " pejırandiye. Bona vê ji bernameyeke çalakiyan daye ber xwe û wê dı seranseri sala 1995 àn da bı ci bine.

Lı gor dazaneke Komisyona kar û xebatan ya Ehmedê Xani û Mem û Zin`ê, KOMKAR dıxwaze dı vê munasebetê da her wısa çand, edebiyat û hunera kurdi lı dervayi welat bıde naskırın. Dı nav vê çarçovê da çend xebatên ku komisyonê daniye ber xwe ev ın:

- *Newroza sala 1995àn wê wek Newroza Ehmedê Xani û Mem û Zin`ê bê piroz kırın.*
- *Mehmed Emin Bozarslan wê lı gelek bajarên Elmanyayê dı cıvinên amadekırı da beşdar bıbe û bıpeyive.*
- *Dı payiza 1995àn da bı beşdariya gelek hunermendan şeveke çandi wê bê amadekırın. Gırani wê lı ser Ehmedê Xani û berhemên wi be.*
- *Dı warê resım, karikatur, afiş, çirok, şano, lêkolin û h.w.d. da lecan saz bıkın.*
- *Disa dı payiza 1995àn da konferanseke navnetewi bê sazkırın. Gelek pıspor û zanayên bıyani û kurd wê lı ser Mem û Zin`ê û Ehmedê Xani gotar û lêkolinên xwe pêşkêş bıkın. Jı her ali va şexsiyeta Ehmedê Xani û berhemên wi bên şırovekırın û nıqaşkırın.*

Lı gor agahdariya ku me jı mamoste M.E. Bozarslan stendiye, dı demeke pır nêzik da çapa nû ya "MEM Û ZİN`ê"derdıkeve.

## Hestên Xwendevan û

# Labirenta Cınan




**Ehmed Tewfiq**

Dema ku merıv dest bı xwendına çirokekê an ji romanekê dıke, dı çend rûpelên pêşin de diyar dıbe ku ev roman wê weke xwarıneke xweş be û merıv wê xwarınê berdewam dıke an ji wê kelê xav be û ew xwarın dı ber merıv de naçe û berdewambûna wê ji lı ser mêji wê geleki zor be. Yek jı wan romanên ku bı tam û balkêş a nıviskar **Hesenê Metê** bû ya ku bı navê **"Labirenta Cınan"** kete destê mın. Jı ber gıringiya wê dıxwazım şırove bıkım û her weha ji, nêrinekê lı ser wê bıdım û dı nav rûpelên Roja Nû da binım zımên.

Labirenta Hesenê Metê dı destpêka rûpelên xwe yê pêşin de xwendevan lı ber pêlên xwe dıbe û derbasi nava gerinoka cıvata *"gundê dinan"* dıke. Qehremanê nıviskar Xoce ye. Navê wi Kevanot e. Qey qedera Xoceyê belengaz bû ku berê wi dane gundê dinan da ku lı wır dı dıbıstanê de dersan bıde. Nıviskar bı şêwazeke (metod) gelek xurt û cıwan qehremanê xwe derbasi nava cıvata gund dıke. Weha ji tê diyar kırın ku, Mamoste pır dıltenık e. Dema ku serpêhatiyeke ne xweş dıbine, dı dılê xwe de gelek tûre dıbe. Pışti dan û stendına wi bı şêneyên (bınecih) gund re û serpêhatiyên ku ditın û yên bıhistın, wek : Keçıka şeş sali ya ku mar pê vedabû û çiroka pısmamê Gebrano yê ku hin yazdeh sali bû û bavê wi ew dışande şevinê gayên cot, jı tırsa lal dıbe û weha lal dımine ta Xwedê emanetê xwe jê dıstine. Mamoste xweş tê gıhişt ku jı bo wana guhertınek pêwist e. Weha ji tê diyar kırın ku Xoce wê ne tenê mamostetiyê bıke, belê wê rola sosyologeki ji bavêje ser mılê xwe. Dı vır de nıviskar qehremanê xwe dıxe sergêjiyekê, ku ew ê bı çı rengi problem û nexweşiyên şêneyên gund çareser bıke. Dı vır de ji, xwendevanên Labirentê bı hêrzdan (hewldan), bı şewq bı romanê ve tên gırêdan û dıxwazın bı lez bıgıhijın serpêhatiyên ku wê bıbın. Jı ber ku xwendevan bı xwe ji, xwe wek qehremanê vê Labirentê dıbine, nexasım dema ku hêrskırın (rakırına hestê) dı hevokê de bı pergaleke cıwan û bı şêwazeke torevani ya xweş hatıbe danin. Ev şêwazê hêrskırınê ku yek jı şertên romanê ye, lı cem Hesenê Metê bı rengeki pır xurt hatiye danin.

Dem dıçe û gewdê qehremanê me dı nava

pêlên cıvata dinan de roj bı roj sıst dıbe.

Jı bo ku nıviskar rehetiyeke cani bıde qehremanê xwe û her weha ji bıde xwendevanê Labirentê bı nigareke gelek cıwan panoramayekê jı malê gund bı perika (fırçe) pesnê xwe dınexşine. Mal bı mal jı ali derve de pêşani merıv dıke û dı warê cografi de ji mal bı mal sinor dıke. Herweha ji, xwendevan derbasi malên gund dıke. Her malek taybetiyek xwe heye, wek nımûne Mala Poznikal. Gavanê gund e, mıroveki pır paqıj e û tu kes jê naêşe. Xort lı mala wi dıcıvın, jı ber ku pencera malê raste rasti bira gund e. Xort dı pencerê re lı qizıkan temaşe dıkın, jı ber vê yekê ji navê pencerê bûbû "*Pencera Dılan*". Mala Risoro "*lı gor gotına wi, ew bavê şeş parsûyên xwar e*", *ango şeş keçên wi hene loma ji dıbêje "Xwedê bı mın re ketıye qayışê !...*" Gelek xwezgini dıhatın cem û keçên wi dıxwestın, lê Risoro qebûl nedıkır. Keça wi ya mezın ku lı dor bist û çar salan bû, hate revandın. Pıştı wê keçên wi cote cot dıhatın revandın. Loma ji jı jına xwe re dıbêje : "Jın parsûya xwar e, rûreşiya dê û bavan e... raste rast ji bona mala me hatiye gotın". Mala Kopo û bırayê wi yê çavbeloq. Dı vê malê de sih û sê kes ın. Pıştı mırına bırayên wi, Kopo jınên wan lı xwe mehr dıke...

Nıviskar diyar dıke ku, şanzdeh mal lı gund hene. Wek mın got, dema ku nıviskar derbasi maleki dıbe karektera hemû endamên malê tine ber çav. Jı çavtengiyê, dinitiyê, mezınahiyê, olperestiyê û hetani doxinsıstiyê ango weke darıstanekê ku hemû cûre teba dı vi gundi de peyda dıbın. Mebesta nıviskar ji, jı vê şırovekırınê ew e ku hemû nakoki û nexweşiyên cıvata kurdi yên seqet bine ber çav.

Pıştı vê şırovekırına lı ser malên gund, nıviskar yekser rewşa Nêrgıza Koçer, ku xanıma Mamoste ye, tine ber çav û dı cıvata Xanê de bı cih dıke.

Xanê, yek jı qehremana romanê ye. Jıneke pır henekvan e û dı mala xwe de ji, her ku zıkeki wek ê Gûziyê, ku jı derdê Pero din bûye, têr dıke, kêfxweşiya wê lê zêdetır dıbe. Nıviskar ew rûmet û sadebûna jına kurd dı Xanê de diyar dıke.

Diyar e ku zıkê Nêrgıza Koçer, heft mehi ye, bo vê yekê ji dı vi gundi de jı Xanê çêtır kesi nabine da ku derd û êşên xwe û waswasên ku pê re çê dıbın jê re bı lêv bıke. Pıştı ku Nêrgıza Koçer jı Xanê re bûyera şeva çûyi ya Siyabendê kor ê notırvan dıbêje, Xanê lê vedıgerine û dıbêje: "*Siyabend merweki dılpak e, ez dızanım nuha disa jı me çêtır cınên wi hatıne dorê, xew lê herımiye, nexweşiya te ketıye bira wi:*" Dı vır de Nêrgıza Koçer mat dımine, "... saxık, din, cıni "nema kare jı hev derxinın loma ji weha dıbêje: "*... çı din û cıniyên dunyayê hene, Xwedê ji hemû lı vi gundi berhev kırıye.*" Dı vır de nıviskar vê suhbetê nivcû dıhêle û bı rengeki komedi û herweha ji hıştiye ku merıv çemeki jı hêsran lı ser sedemên dinitiya Gûzi de bırıjine, pevçûneke bı dev dı navbera Sayibê xerıfi, mêrê Xanê û Gûzi de tine ber çav. Nıviskar, Gûzi bı vê stranê derbasi hewşê dıke :

"*Hewar e mirê mın hewar e*

*Mala Sayib mala mir û miran e*

*Pero xanım e, xatûn e, delala dılan e*

*Delala dılê bırindarê şûr û xenceran e*

*Hewar e , hewar e mirê mın hewar e.*"

Hewara Gûzi tevzinokan bı laşê xwendevan dıxine.

Mala Sayib, wek ku dı romanê de hatiye diyar kırın, ne mala mira ye lê weha gotıye jı ber ku Xanê pır lê mıqate ye. Lê Pero evindara wi bû. Xwedê jı bavê wê ne razi be û wi bı rehma xwe şa neke ku Pero dûri Gûzi kır û jı gund ji bar kırın. Wek ku tu avê jı ser guleki bıbiri! Ma wê ew gul çawa neçılmıse, ma wê çawa Gûzi din nebe. Gûziyê dılbırindar bo vê sedemê, wek dineki hate nas kırın.

Dı sedsaliya bistan de ji, cıvata kurd wek Mem û Zin nehiştıye ku Gûzi û Pero bı hevdu şa bıbın. Qey ev ji qedera xort û keçên kurdan e. Hesenê Metê dı vır de nexweşi û nakokiyên dı cıvata kurdi de, bı taybeti rewşa ku xortên kurd tê re derbas dıbın, dı şexsiyeta Gûzi de diyar dıke.

Pıştı ku suhbeta Sayib û Gûzi jı qerfan û henekan tê qedandın, Xanê û Nêrgıza

Koçer lı nûserê xwe vedıgerın û Xanê serpêhatiya Kewê, ya ku bayê cınan lê ketıbû, jê re şırove dıke.

Kewê, spehibûn û bedewbûnê jı keseki re nehiştıbû, "*... poreke zer û fılıki xwe jı jor de berdıda ser tılorên wê. Xwediyê bejneke bılınd û dagırti bû. Hustuyê wê dırêj, çavên wê gır û nola van moriyên hespan hêşin bûn. Wek hınareke qelışi lêvên wê jı dûr ve sor dıkırın...*" Bı rasti ji Kewê gelek cıwan e, lê xwezika nıviskar ew bejna wê ya bılınd ne dagırti danibûya, belê weke şıtıleke bihokê yan ji weke tayeke reyhanê danibûya, wê Kewê hin cıwantır bıbûya. Mala Hesenê Metê ava be, hıngi pesnê cıwanbûna Kewê daye ku, dılê xwendevan bı xwe dıkeve mêkewê. Lê pır heyf û mıxabın ku ev Kewa cıwan ji, dı vi gundi de din bûye. Derdê wê û yê Gûzi yek ın. Lê weke ku tê zanin germbûna jınan jı ya mêran bêtır e, loma ji dinitiya Kewê jı yê Gûzi dıjwartır e.

Kewê her roj dıçû ser darê û herdu memıkên xwe derdıxıstın ser kırasê xwe û bı dengeki bılınd bangi Mekrûs dıkır ta ku Mekrûs bê û bı herdu memıkên wê bıleyize. Weha bang dıkır ta ku dıwestiya û bı wê rewşê ji dı nava gund re dımeşiya.

Rojekê ji, jı diya xwe re weha dıgot : "*Erê, anûka êşa serê mın nemaye, Mekrûs hat û destê xwe da ser eniya mın... Dû re ji, destê xwe kır paşıla mın û got : "nermık û xweşık ın...*"

Pışti van bûyeran, bavê Kewê bı destê wê dıgıre û berê xwe dıde Cızirê. Dıbêjın ku lı wê derê şêxeki bı nav û deng heye. Dema ku şêx çend gotınan lı ser dıxwine, Kewê qirin dıkır û dıgot: "*Mekrûs bıreve, Mekrûs!.. Şêxê Cızirê bêbext e, ew ê te bıkuje û mala mın bışewıtine, Mekrûs!...*"

"*Lı gor gotına şêx ji, Mekrûs, xorteki jı wan bûye... Jı me çêtıran. Kewê bı wi re zewıci bûye. Nedıxwest ku şêx wi xorti jı ser rake...*"

Kewê bı vê rengeêşê dımine ta ku Xwedê wê bı rehma xwe şa dıke. Lê hetani mırınê ji, her bang dıkır Mekrûs... Mekrûs.

Bı rasti nıviskar dı vê serpêhatiyê de agır dıxe nava xwendevan. De dı bextê mın de be, eger fırsendek têketa destê şêx, Kewê weha zıwa jı nav lepên wi nedıfılıti. Gelek nımûne lı ser melan û şêxan hene ku, bazdane ser suxteyên xwe û ev dı stranên folklori de ji cih gırtıne. Mebesta Hesenê Metê jı vê serpêhatiyê ew e ku, rewşa keça kurd bıne ber çav bê dı çı agıri de ye û dı bın kijan zagonan de dıji.

Kewa kurd dı bın wan zagonên ku toz û qırêja sedsalan xwe lê gırtiye de dıji û tu bayê xurt ji nehatiye da ku bıkarıbe wê qırêjê paqıj bıke. Herweha cıvata kurd a ku ew şûrê xwe yê bı qırêj bı destê xwe ve gırtıye û lı ser serê yê weke Gûzi û Kewê de hıldayi hiştiye, hin ji ew gef dıdomine. Xanê agır xıste dılê Nêrgıza Koçer û xwendevan ji, jê ne bêpar e. Jı ber wê kerba ku kete dılê wi, dıxwaze dengê xwe bıgıhijine şêniyên gund tevi û weha dıbêje : Dermanê nexweşiya Kewê ne lı cem şêxa ye, ne ji lı cem doktora ye, belê dermanê Kewê lı cem xorteki bı kêr e !.

Pışti van bûyeran nıviskar, qehremanê xwe dı cıvateke pıçûk de dı hewşa mala Şero de datine.

Şero, dı gund de weke berbereki hatiye nas kırın. Lê ew bê pere porê keseki qet çê nake û geleki hez jı pera dıke. Loma ji, Mixoyê notırvan weha dıbêje : "*-Ew bê pere tıliya xwe ji dı çavê merıv re nake,... lê ku tu bıbêji, a ji te re pênc panot û jı dêla heskê ve bı destê xwe wan kuftıkan jı beroşê derxine, Şero wê wısa bıke...*" Pışti gotına Mixo, mamoste jı dêla ku lı wan pend (şiret) bıke û wan dûri van karên weha bıke, lê bêtır Şero hêrs û sor dıke . Weha dıbêje : "*Ya sıtar!.. ewqas ji nabe, lo !... ku bıkanıbe bı lepan wan kuftıkan jı beroşê derxine, ez bı xwe ji pênc panotan bıdım wi.*" Ev ne gotınên mamosteyeki ne, lê diyar e ku ew hurmet jı xwe re nehiştiye dı nava şêneyên gund de, loma ji Şero weha bersiva wi dıde : "*Xuyaye perên te ji dı te de dıxurın, Xoce.*" Şero jı kırt û niva xwe nayê xwarê, eger destê wi ji bê çerm jı wê beroşa kelandi derkeve ji, jı ya xwe danakeve. Nıviskar dı vê serpêhatiyê de serhışkiya cıvata kurd dı şexsiyeta Şero de dıde diyar kırın. Pışti Mixoyê notırvan dit ku Şero jı dıl xwe daye ber vi şerti, lı gotınên xwe poşman dıbe û xwe davêje bextê mamoste ku Şero jı vê peymanê xılas

bıke, lê mamoste ji, jı ya xwe danakeve û vi şerti lı ser Şero gırantır dıke û weha dıbêje : "- *Na, na, kuftıkek ji tê de bımine, nabe. Lı gor peymanê dıwê perçên kuftıkên jı hevketi ji tê de nemine.*" Tadayek pır mezın lı Şero dıke, qaşo mamoste ye!.. Pışti derxıstına çend kuftıkan, kezebşewıtiya Şarıka jına Şero, yekser mısina avê jê re tine. Lê dılgawırê mamoste mısin jı destê wê dıgre û weha ji dıbêje: "*Bı Xwedê napejırinım,.. wısa nabe... dı vê peymana me de ava mısin tunebû.*" Lê Şero wê peymanê pêk tine û hıjdeh kuftıkan jı beroşê tine der û perçên wan ji dı beroşê de nahêle. Destên wi ji, dıtevızın û sor dıbın.

Dı destpêkê de diyar bû ku mamoste, merıveki pır dıltenık e û qaşo dıxwest ku vê cıvata gundê dina rast bıke û wan dûri karên xırab bıke, lê dı vê bûyerê de diyar dıbe ku, nivbayeki dinitiyê lı serê wi ji xıstıye.

Pışti xwarına wan kuftıkan mamoste, bı tariya êvarê re berê xwe dıde mala Beko. Lı wê derê çend nêçirvanên şevê dıgıhijın hev û dıçın nêçira çûçıkan. Mamoste jı dêla ku êvaran hazıriya dersên xwe bıke û şagırtên xwe hin bıke, lê dı wê şevê de berê şagırtên xwe dıde Newala Cınan da ku jı nêçirvanan re kevırên gılover berhev bıkın.

Dı vê derê de xwendevan xweş tê dıgıhije ku, ev karên ku mamoste pê radıbe û rewşa ku ketıyê, ne kêmi ya Sayibê xerıfi ye.

Beri qedandına nêçirê dengê hiske hiska zarokeki tê nêçirvanan. Ew zarok ji, yek jı şagırtê mamoste ye û alikareki nêçirvana ye, navê wi Sılo ye, Sılo, alikariyê dıxwaze. jı bo bavê xwe yê ku lı ber mırınê ye Hemû nêçirvan bı selıkên xwe yên tıji çûk berê xwe dıdın mala Cındiyê bavê Sılo. Nıviskar, xwendevanên xwe derbasi mala Cındi dıke û wek tabloyeke ku şewatê dı mêjiyê wan bınexşine. "*Jın û zarokên Cındi lı ber serê wi rûnıştıne û bı hiske hisk dıqılqılın.*" Hesenê Metê sedemê nexweşiya Cındi şırove dıke ku : "*dı pıçûkatiya Cındi de lı gund pevçûnek çê dıbe û cıwamêrek tê kuştın, bı deh rojan pışti bınaxbûna kuşti, hukumet dıxwaze lı ser cendekê mıri otopsiyekê çêke, tev doktor, komita hukumetê, muxtar, gundiyên didevan û zarok ji berê xwe dıdıne gorıstanê*", yek jı wan zarokan ji, Cındi bû. Beri ku dest bı kolana tırbê bıkın, doktor lı zarokan hêrs dıbe û wan jı wê derê dıde ali, "*Cındiyê pıçûk xwe dıde aliyeki xırab û lê temaşe dıke, temaşe dıke û dıbine ku ew çawa gornê dıkolın, bersalê dı ser serê mıri re radıkın, û tev cawê sıpi mıri jı gewriyê şerjê dıkın, serê jêkıri radıkın ku têxıne sındoqeke textin,... dı wê gavê de wek ku şêneyên gund dıbêjın, jı şeytani re serê mıri jı destê wan dışemıte û disa gêri ciyê (xwe) dıbe.*"

Nıviskar, ev nexşetırs wısa ava kırıye ku tevzinokên tırsê bı laşê xwendevan dıxine û xwendevan bı xwe nıkare xwe lı ber vê bûyerê bıgre, nema kare balansekê bıde xwe. Ma ew ê çawa ew tırs dı dılê yê weke belengazê Cındi de, yê ku bı çavên serê xwe ditiye, wek ziroyekê (kurm) pê re neji û nemine. Lê ev nexweşi ne ya Cındi bı tenê ye, belê ya mıletên Rojhılata Navin tevi ye û bı taybeti ya mıletê kurd e. Dema ku merıv derbasi nava rûpelên diroka kurdi dıbe bı hezaran nımûneyên weha dıbine, lı Kela Dımdım, lı Haci Umran, lı Mehabad, lı Diyarbekır... Roj lı nivro lı pêş çavên mılet, xort, jın û kal kuştıne, daleqandıne û bı hezaran êşkence kırıne ta mırınê yan ji gullebaran kırıne. Ya heri balkêş, ku dûri mafê mırovayetiyê ye, bı sedan kes dı zinadanan de bı lêdanê hatıne kuştın û cendekên wan bê seri yan ji bê pê û dest şandıne bı ser xızmên wan de da ku saweke tırsê têxın dılê mılet. Loma ji otopsikaran bı şeytani serê mıri jı destê xwe dışemıtinın ta ku wê sawê têxın dılê yê weke Cındi, gelo ew kesên ku bı çavê serên xwe ew panoramayên jı çemên xwinê ditıne û hêj ji dıbinın, wê çawa ew saw pê re neji, wê çawa ew kes wek Cındi ne nexweş be... Rejimên xwinrêj bı van metodên xwe yên bı gemar hiştıne ku hertım mıletên bındest dı wê tırsê de bıjin. Ev bûyera Cındi tabloya Ayvazovski ya bı navê "*Pêla nehan*" tine ber çavê merıv.

Dı tabloyê de qeyikek dı deryayekê de ye û pêleke pır xurt lê dıde, qeyikvan hewl dıdın ku xwe rızgar bıkın, lê nexşvan weha diyar kırıye ku ev pêl gelek dıjwar e û rızgarbûna merıvên tê de ji pır zor e, diyar e ku pêla neha ya heri xurt û dıjwar e,

loma ji navê wê ji dı bın "Pêla neha" de hatiye danin. Gelo dı jiyana mamostê me de ev pêla Cındi, ne wek ya Ayvazovski be ?.., yê ku dı qeyika jiyanê de dı nav deryayek pırsgırêk de dıji.

Em ê vegerın bê ka Cındi dı çı rewşê de ye û guhdariya hewar û qirina wi bıkın.

Serê xwe lıba dıke, dıgri, dıkûre û weha ji dıbêje : "*Na, na, ez bı goriya we!... Sinoyê mın pıçûk e, kezeba mın e... ez nıkarım!... Dıstê mın lê nagere... Hewar! baş e, baş e de wi tevşoyê bıdıne mın! Ez ê bı ya we bıkım...*" Ew tırsa ku jı pıçûkani de bı Cındi re maye weha tê ber çavê wi ku, hın merıv jê dıxwazın ku serê lawê xwe bı tevşo jêke. Loma ji, "*destê xwe dı bınê lıhıfê de dıqoqızine ku derxine*", bı vê tevgera wi, yekser Mixo û Hoto destên alikariyê dırêji wi dıkın û xwe davêjın ser singa Cındi û bı destên wi dıgrın da ku xwe zêde nelıvine.

Nıviskar bı rengetırsê germbûnekê bı laşê xwendevan dıxe û şûna tıliyên wi lı ser pelên romanê xweydan dıde. Gelo dı vê panoramaya lı ber çav de wê qehremanê me dı çı rewşê de be? Mamoste dınıhêre bê çawa Cındi keftûleftê dı nava destên wan de dıke, beheti (matmayi) dımine, yekser bı wan destên xwe yên neşûşti jı xwina çûçıka, destên alikariyê dırêji serê Cındi dıke. Ew xwina destên wi û xweydana nexweşiya Cındi lı nav hev dıkeve û bêhna wê xwe lı pozê mamoste dıde der. Ev pêşana han saweki dıxe dılê wi, loma ji bı dılvereşin destên xwe yên alikariyê bı şûnde vedıkışine û dı cihê xwe de sar dimının.

Cındi dıqire, natebıte û gotınên ku jı devê wi derdıkevın kes tênagıhije, lê dıbêjın ku ev, zımanê afridên piroz ın, zımanê cınan e.

Perda tırsê xwe lı belengazê Xoce pêçaye û çavên wi beloqi dımine, nema kare tu tışti jı hev derxine, hemû zanıstiya wi ya kevn û nû lı nav hev dıkevın. Pışti ku nıviskar tebatiyekê dıde Cındi û berê Xoce ji dıde mal, wê şevê tebat pê nakeve, dıkeve ramanên xwe yên aloz. Bêguman dema merıv rewşeke weha de be, jiyana wi ya bori tev weke filmeke sinemayê lı ber çavê wi derbas dıbe. Dı wê filma ku dı ber çavên Xoce de derbas dıbe, pûtê dapira wi ji tê pêş çavê wi û gotına wê ya ku dıbêje "dergûşa we ê rûyê dınyayê nabine", jı guh dernakeve. Loma ji Xoce bı qirin e û dılerıze, dıkeve rewşeke ku ne kêmi ya Cındi ye.

Nıviskar gotına dapira wi bı cih dıke, zarokê wan ê ku beri dema xwe jı ber Nêrgıza Koçer bı mıriti dıçe.

Bûyerên ku jı serê mamoste derbas bûn, nûserên (hedis) lı ser cınan, nexweşiya Cındi, mırına zarok ev tev dıbın sedemên ku mamoste noqi nava labirenta cınan bıbe.

Hesenê Metê dı dawiya romanê de mamoste jı gund derdıxe û berê wi dıde nexweşxanan. Lê xwendevan xweş tê dıgıhije ku dermanê Xoce ne lı nexweşxana ye, belê dermanê wi dı cıvateke pêşketi de ye û dı sistemeke demokratik de ye.

Xwendevan bı hêsırbarin lı ser rewşa Gûzi, Kewê, Nêrgıza Koçer, Kevanot... vê romanê dıqedine, lê dı hundırê xwe de pirsek dımine. Gelo nıviskar dı vê romanê de ew tariya ku cıvata kurd tê de dıji, ew perda nezaniyê ya ku lı xwe pêçaye , nıkarıbû ronahiyekê tê de bıbine yan ji bıhêle jı bo nıfşên pêşerojê?

Dema ku merıv dı nav tariyê de bıgere , merıv ronahiyê dıbine. Eger nıviskar, Gebranê Baco jı universitetê dernexısta, zarokê Nêrgıza Koçer jı ber nebıra yan ji şagırtên Xoce nekırıbûya zarokên afridan û cınan, karıbû yek jı wana lı ezmanê cıvata kurd bıkıra stêrkek. Jı ber ku realiteyek heye û anıha bı hezaran xwendevan, tarixzan, ebûqat, torevanên kurd hene û bı xwe ji jı wê cıvatê derketıne, jı nıvıştan ji rızgar bûne.

Lê disa ji, xwendevan weha dıbêje : Ku romanek weha ya ku bı honandıneke torevani hatiye danin, romaneke ku rolê dıde hemû qehremanê xwe û tu kes jı wan neavêtiye pışt guhê xwe, romaneke ku hemû ragezê torevaniyê tê de hebın bêguman wê cigehê şanaziya rewşenbirên kurd be.

□

# RENGÊN GOLA DOKANÊ

Sıbehan bı ibrışımên sis, jindar û cıwan
Dı bın roja nivro dışewıte, zivin e
Lı bendavên teng nefti
Jı dûr va bınewşa şin e
Danê êvarê bı rengê sıfarê çiyan
Gava roj dıçe avan pembeyeke rengavêti
Dı mıxurbê da rengê cemedê, deryayeke mıri
Dı hiveronê da zivin, bı xewn û xeyalan
Dem heye ewrên sis tê da xwe dışon
Dem heye rısasi, xemgin û zizin
Carcaran ji kokteylek e jı rengan
Lı şevên reş bı şıridên sırme ye
Bı mırçan û mırari
Masiyên wê bı stêran dılizı

*Kemal Burkay*

# DESTPÊKA EDEBİYATA NIVİSKİ YA CİHANÊ:

# Destana Gılgamêş




*Gılgamêş bı du gamêşan va xuya dıke. Wêne lı ser haleteki muzikê jı dewra sumeriyan maye.*


*Haluk ÖZTÜRK*

Edebiyat, hunera gotın û nıvisandına peyvan e, ya ku lı ba mırovan hest û heyecana bedewtiyê (rındiyê) şiyar dıke. Dı kurdi da jêra wêje ji tê gotın. Peyva *edebiyat* peyveke erebi ye, ku em ji dı kurdi da gelek caran wê bı kar tinın. Dı zımanên Ewrûpi da jêra *literattur* tê gotın. Lê peyva litteratur bêtır dı maneya berhemên nıvisandi û kıtêban da tê xebıtandın. Lewra ew bı eslê xwe jı *littera* yûnani tê ku maneya wê tip (herf) e. Lê bê guman beri ditına tip û sistemên nıvisandınê ji hemû gelan dı zımanê xwe da berhemên edebi yên cure-cure afrandıne. Jı serdema ku mırov bûne xwediyê zımaneki qısekırınê heta iro herdem çirokbêj û dengbêjan lı ser bûyer û serpêhatiyên cıvata xwe, lı ser şer, lı ser evinê, lı ser çêbûna dınyayê û sırra mırınê gotıne û strane. Berhemên wan yên edebi bı şêweyê devki jı nıvşan (nesıl) derbasi nıvşan bûne û demeke dırêj jiyane.

Ango em dıkarın bı kurti bıbêjın ku, du şêweyên edebiyatê hene: 1)-Edebiyata devki (zargotın; folklor), 2)- Edebiyata nıviski. Û edebiyata devki jı ya nıviski geleki kevıntır e.

Çawa tê zanin hina iro ji dı çanda me da gelek berhemên folkori hene ku rêç û şopa wan xwe dıgıhine kûraya hezar salan. Lewra dı axa navbera çemên Dicle û Fıratê da ango lı ser axa Kurdıstana iroyin û welatên ciran, şarıstaniyên






*Çandên mırovatiyê yên heri pêşin lı der-dorên çemên mezın peyda bûne.*



*Nıvisara mıx*

(medeniyet) cihanê yên heri pêşin ava bûne. Nıvis cara pêşin lı ser erdê navbera çemên Dicle û Fıratê hatiye ditın. Herwısa edebiyata nıviski ji lı vê derê dest pê kıriye. Gelê kurd yek jı gelên heri kevın yê vê navçê ye. Û Kurdıstan bı heqi tê bı navkırın wek ***Dergûşa Şarıstaniyan.***

Hema hema hemû çandên mırovatiyê yên heri kevın lı der-dorên çemên mezın peyda bûne. Lı seranseri dırêjaya çemên Fırat û Diclê, Nilê, Hindûsê, Huanghoyê (Çemê Zer) gelek şarıstaniyên cuda ava bûne. Cara pêşin lı van deran sistemên nıvisandınê derketıne holê. Nıvisara mıx dı nav xelkên bıneci yên der-dora çemên Fırat û Diclê da, hiyeroglif lı Mısırê, nıvisara çini ya şıkılan û alfabeya sansıkrit lı Hindistanê mecal dane ku berê pêşin lı van deran edebiyata nıviski peyda bûye.

Nıvisarên heri kevın yên ku iro em pê dızanın, jı aliyê SUMERİYAN bı nıkılê qamûşê lı ser tablêtên heriyê hatıne nıvisandın. Tablêtên şıl pêşiyê lı ber tavê, dûra ji dı nav agır da, hatıne zuwakırın û hışkkırın. Sumeri lı dor 3500 salên BZ (Beri zayinê) lı der-dora çemên Dicle û Fıratê bı ci bûne û lı vır hukum kırıne heta ku lı dor 2000 salên BZ Babilon û Asûriyan dewlet avakırıne. Van herdu gelên sami ji ev sistema nıvisandınê pejırandıne û dı zımanê akadi da bı kar anine û pêşda bırıne.

Dı sedsala 19-an da arkeologan bı qasi niv milyon lewhayên bı zımanên sumeri û akadi ditın. Lêkolinevan û zımanzanên Ewrûpi pıştı xebateke dıjwar karıbûn wan bıxwinın û şırove bıkın. Bı saya van nıvıştan parçeyeki gırıng yê diroka mırovatiyê derkete ronahiyê.

Parek jı van nıvıştan, jımarên çûyin-hatınên abori ne, belgeyên idari û pırsên jiyana pratik ın. Dı nav wan da belgeya heri balkêş Yasayên qralê Babilonê HAMÛRABİ ne, ku lı ser 44 stûnên nıvisê dı rûyê kevırên mezın da hatıne ⇒




# JI DİROKA ROHILATA NÊZİK Û NAVİN

**Gelê kurd yek jı gelên heri kevın yê vê navçê ye. Û Kurdıstan bı heqi tê bı navkırın wek *Dergûşa Şarıstaniyan***

nıtırandın. Ew qanûnnama heri kevın e dı dirokê da.

## Destana Gılgamêş

Beşeke mezın ya nıvıştan navê xudayan (navê 3000 xudayên sumeri hene) ayinên dini yên lirik, duayên jı bo pakkırına nexweşiyên cuda nın. Herweha gelek gotınên pêşiyan, destan, evsaneyên ser çêbûna dınyayê, stranên şin û şayiyan, stranên ser qehreman û xudayên Sumeriyan û Babilonan hene. Dı nav wan da Destana GILGAMÊŞ cihê heri bı rûmet dıstine. Ew wek berhema edebi-nıvisandi ya heri kevın derbasi diroka edebiyata cihanê bûye.

Pıraniya destanan nivcû ne. Parçên wan kêm ın. Tenê çend heb jı wan bı temami hatıne berhevkırın. Destana Gılgamêş yek jı wan e. Ew dı kıtêbxana qralê asûri Assûrbanipals (600 BZ) da lı Ninova´yê (Lı başûrê Kurdıstana iroyin, nêziki bajarê Mûsılê) hatiye ditın. Destan lı BABILONÊ lı dor 2000 salên BZ lı ser duwanzdeh tablêtan bı zımanê akadi hatiye nıvisandın. Lê beri wê, bı zımanê sumeri ji lı ser Gılgamêş stran hatıne nıvisandın. Mıxabın jı wan nıvıştên sumeri tenê parçeyên jı hev qutkıri yên nivcû mane dı destê me da.

Dı beşeke destana temam da weha pesnê Gılgamêş tê dayin.

**Xudayên mezın baba-egit afrandıne**
**Gılgamêş**
**Yanzdeh zend (mıl) dırêj bû bejna wi**
**Bı qasi neh hembêzên vekıri bı ber bû**
**singa wi**
**Du beşên wi xuda, beşê sêyem mırov e**
**Gewdê wi çê û spehi ye-**
**Wek gamêşeki hov e ew, bı meşa xwe va**
**geleki kubar**
**Bê hemsal e derba çeka wi**

Çawa tê zanin mırovan jı berê da xwestıne sırra jiyan û mırınê fehm bıkın. Xeyala ku mırov bıkarıbe jı mırınê ra çareyekê bıbinın herdem hebûye. Tema destana Gılgamêş ji lı ser vê yekê ye.

Şervaneki mezın e qral Gılgamêş, zora dêw û cenawıran dıbe. Tenê mıroveki hov, bı navê Enkidû, dıkare hêza xwe lı ber ya wi bıpive. Enkidû jı insanan dûr dıkeve, dıçe bı heywanên çolê ra diji. Lê wısa dıqewıme ku rojekê Gılgamêş û Enkidû hevdu dıbinın û dıbın destebırakê hev. Pıştî demekê Enkidû nexweş dıkeve û dımre. Lı ser mırına hevalê xwe Gılgamêş geleki lı ber xwe dıkeve, jı pêşeroja xwe şayişê dıke. Radıbe terkeseri dınyayê dıbe, bı çol û beriyan dıkeve da ku jı mırınê ra çareyekê bıbine. Ev yek dı destanê da weha hatiye gotın:



■ *Gılgamêş jı bo jiyaneke ebedi lı çareyekê dıgere lê bı dest naxine...*
*Desen: M. Zieler- jı bo wergêra destana Gılgamêş ya bı zımanê danimarki*

**Gılgamêş dıgere lı çol û beyaran**
**Bı şin û gırin e bo hevalê xwe Enkidû:**
**"Qeyê ez ê ji bımrım wek Enkidû?**
**Gelo tıştê bı wi bû bı mın ji ne be?**
**Tırs ketiye hundırê mın;**
**Ez dıtırsım jı mırınê û bı çola ketıme."**

Gılgamêş dıgere ku dendıkê jiyanê bıbine, da ku hevalê xwe sax bıke û ew bı xwe ji bıbe keseki nemır. Lı ser salıxdana dıçe cem kaleki bı navê Ût-napıştim û jı wi ciyê dendıkê hin dıbe. Ût-napıştim yekane kes e ku karıbûye jı çemê gunehan derbas bıbe û bıgıhije mafê nemırıtiyê. Dı dawiyê da Gılgamêş dendıkê jiyanê dıbine, lê hema wê gavê, hina wi dendık neavêtiyê devê xwe, marek tê jı ber destê wi dendıkê dıgre û dıçe. Gılgamêş pol û poşman vedıgere. Dı vegerê da ruhê Enkidû wek bayeki jı bınê erdê dertê pêşiya Gılgamêş û jê tika dıke ku ew ji lı ber sazûmana dınyayê stû xwar bıke.

Çiroka Gılgamêş, bı variyant û motifên hıneki cuda be ji, dı zargotına kurdi da jiyaye heta roja iro hatiye. Tıştê heri balkêş ji ew e ku ew bı hezaran sal pıştî nıvisarên sumeri, jı kıtêbên dini ra ji bûye babet. Bûyereke geleki nêziki vê çirokê, dı Tewratê bı rengeki dini û wek bûyereke bı rasti qewımi hatiye behs kırın... Dema dı nivê sedsala çûyi da kıtabeyên sumeri û babiloni hatın ditın û xwendın; xasma dı derheqa rastiya baweriyên xırıstiyaniyê da bıvê nevê şık û sergêjiyeke nû rû da...


**Çavkani:**

- *Levande Litteratur från Gilgamesj till Bob Dylan- Tore Zetterholm*
- *Litteratur Handboken, När? Var? Hur? serien.*
- *Alla tiders historia*
- *Atlas till historien, Esselte Studium*
- *Litteratur orientering, Natur och Kultur*
- *Mitolojiyên Mezopotamya, E. Petişka*

## Pırtûka çirokên hezar salan e:

# "MİTOLOJİYÊN MEZOPOTAMYA`YÊ"

*Pırtûka nıviskarê bûlgari Edward PETİŞKA ya bı navê "MİTOLOJİYÊN MEZOPOTAMYA", nuha bı kurdi ji derketiye. Cemal BATUN ew jı bûlgari wergerandiye kurdi û xanıma wi Vanya Lapardova-Batun ji jê ra gelek nigarên rınd çêkırıne. Dı pırtûkê da jı mitolojiyên Mezopotamyayê yên kevın çar çirokên bıjarte cih gırtıne. Çiroka Gılgamêş ji yek jı wan e û ya heri dırêj e. Herweha yek pêşgotınên nıviskar û werger ji dı destpêka pırtûkê da hatıne pêşkêşkırın.*





*Ev çirokana nımûneyên heri kevn yên edbiyata navçê û ya dınyayê ne. Bêşık ew ne tenê serbılındi û rûmetên gelên Mezopotayayê ye, hemû insaniyet xwediyê van rûmetên çandi-diroki ne. Lê wek xelkeki Mezopotamyayê yê kevın xasma gerek e em kurd bı hebûna van rûmetan serbılınd bıbın. Çımki ew raste-rast çavkaniyên çanda me ne.*

*Roja Nû dı vê hejmara xwe da cih dıde yek jı wan çar mitolojiyên pırtûkê. Ew mitolojiya sêwemin e, ya ku behs dıke ku Etana, mirê bajarê Kişê çawa bılındi ezmanan bûye...*

# Mitolojiya sêyem

## Ya ku tê de tê gotın bê çawa mirê bajarê Kişê bılındi ezmanan bûye.



*Wêne: V. L-Batun*

Qertel û marê reş bıryara xwe dıdın ku bıbın destûbrakê hev. Lı ber erdê û Xwedayê Rojê Şamaş ji sûnd xwarıne, da kes jı wan bı yê dın re ixanetê neke.

Weha Qertel bı bılındayiya çıyê ve fıriye û marê reş ji bı çıyê ve hılkeşiyaye.

Gava Qertel carekê kerek gırtiye, bangi marê reş ji kıriye. Marê reş ji tevli marçêlikên ⇒

xwe ve û Qertel bı hev re ker xwarıne, Gava ku marê bı xezalekê ve daye, wê ji bangi Qertel kıriye û Qertelê ji bı çêlikên xwe ve xezal xwarıne. Weha weki du bıra, wan tıştên bıdest xıstıne lı hevdû behr kırıne û navbera wan her çûye baştır û baştır bûye.

Çêlıkên Qertel mezın û bı hêz bûne. Bı mezınbûna wan ve, ramanên xerab dest-pêkırıne bıkevın serê Qertelê mezın. Ev ramanên xerab dı serê wi de baş cihê xwe gırtıne û wi destpêkıriye wan vekıri jı çêlıkên xwe re ji bıbêjê:

- Ez ê bılınd, bılınd bı ezmanan ve bıfırım û paşi ezê weki bruskê xwe ber bı erdê ve berdım. Weki tirê ezê hêlina marê reş, qul û wêran bıkım. Ez ê dı demeke weha de vi tışti bıkım, gava ku marê reş derketiye nêçirê û dı hêlinê de tenê çêlikên wê mabın. Ez ê çêlikên wê têra xwe bıxwım.

Dı nav Qertelên cıwan de, yê heri bıaqıl berê xwe daye bavê xwe û jı wi re gotiye ku dê xezaba xwedayê rojê Şamaş bıkşinê ser xwe.

Lê, disa ji Qertel bı ya zaroyê xwe yê bıaqıl nekıriye û avêtiye ser hêlina marê reş. Hemû çêlikên marê reş xwarıne, hêlin wêran kırıye û carek dın ber bı ezmanan ve fıriye.

Marê reş ji, jı nêçira xwe vegeriyaye. Gava gıhiştiye hêlina xwe, baweri bı çavên xwe ne aniye. Hêlina wi hatıbûye wê-rankırın, çêlikên wi wındakırın. Mala wi xerabûye, hêstıran jı çavên wi xwe berdan e... Lê, wi famkıriye ku ki ye- yê mala wi xerabkıri û çêlikên wi xwari...

Dılê marê dagırti bı xezebê, xwe daye rê û çûye ber Xweda Şamaş. Lı ber wi gazındên xwe kırıne û gıliyê Qertel kırıye.

- Qertel hevaltiya me xerakır. Hêlina mın hılweşandiye û çêlikên mın xwarıne- heta ez lı nêçirê bûm, wi jiyan lı ber mın reş kıriye- ez hêvi dıkım, xezaba xwe lı wi bine. Xerabiyên heri mezın bine serê wi, çawa wi mal lı mın xerakır, a wi wêrantır bıke. Erd û ezman her du dı nav lepên te de ne, rê nede Qertel da bıreve.

Gava guhdariya marê reş kıriye, dılê Şamaş bı xwe êşiyaye. Berê xwe daye mar û jê re gotiye:

- Tu dıkari heri, xemê nexwe! Ez ê gamêşeki mıri rêkım ser riya te. Zıkê gamêş veke û xwe tê de veşêre. Dê û çûk û teyr destpêbıkın xwe bavêjın ser gamêşê mıri. Dı nav wan de, dê Qertel ji were da jı laşê gamêş behra xwe bıgre û bıxwe. Gava wi nıklên xwe avêtın zıkê gamêş, tu ji pê ve bıde- baskên wi bışkine, heyfa xwe jı wi bıgre û wi bavêje meydana ku nêçirvan agır dıbarının ser nêçirên xwe.

Her çawa Şamaş gotiye, marê reş ji weha kıriye. Dı riya xwe de leqay gamêşeki mıri hatiye, zıkê gamêş qelaştiye û tê de xwe veşartiye. Jı hemû deran çûk û teyr xwe avêtıne ser laşê gamêş. Laşê gamêşeki weha mezın, bêgûman jı bo xwarına çûkan û tey-ran dewlemendiyek mezın bûye, têra xwe jê xwarıne. Qertel ji bêhna goştê gamêş gırtiye û jı Qertelên xwe yên cıwan re go-tiye:

- Nêziki vê derê bêhna goştê gamêşê tê. De zû em bı wır ve bıfırın û têra xwe bıxwın.

Qertelê cıwan ê heri bıaqıl lı bavê xwe zivırıye:

- Ya heri baş ew e, ku em bı aliyeki dın de bıfırın. Ger marê reş xwe dı zıkê gamêş de veşartıbe û lı hêvya te be,, tê çı bıki?

Qertelê mezın guh nedaye gotınên Qertelê xwe yê jir. Bılınd, bılınd fıriye û xwe ber-daye bı jêr ve, pencıkên xwe jı laşê gamêş ve derbaskırıne. Hineki weha rawestıyaye, gava tıştek bı serê wi nehatiye, zıkê gamêş qelaştıye. Wê çaxê marê reş xwe avêtıye û pê va daye. Başkên wi şikenandıne û zımanê xwe derxıstıye ber bı çavên Qertel ve.

- Ez hêviyê jı te dıkım, lı mın bıbûre, mın efû bike Qertel gotıye - tu çı bıxwazi, ez ê jı te re pêkbinım.

- Jı bo çı ez lı te bıbûrım û te efû bıkım - marê reş qêrin da ye - jehra xwe berdaye laşê Qertel û hestuyên wi şıkenandıne. Lê, disa jı derbeya dawi lı Qertel nexıstıye. Ew avêtıye meydana nêçirvanan, ên ku agır bı ser nêçirên xwe ve dıbarının.

Dı vê demê bı xwe de mirê bajarê Kiş - Etana, hatıye ku qurbaneki pêşkeşi xwe-dayan bıke. Dı nav mıja muqades a ku bêhnên heri xweş jê tên, dı bılındayıya ez-manan de, hatıye da tıka (rıca) ya pireka xwe bıghine xwedayan, da bıbın xwedi za-rok.

Etana bı hêvi û duayan lı ber Xweda Şamaş xwe berdaye ser kabokên xwe :

- Ya Xwedayê mezın, xwedıyê me Şamaş, nebatekê bıde mın, da daxwaza me bıcih were. Riya nebatê nişani mın bıke, jı bo ku

dı mala mın de fêkıya malbatê - zarok peyda bıbe.

Şamaş lı daxwaza Etana guhdari kırıye û bersiva wi weha daye :

- Rehet bıbe, gumanê nexwe. Bı riya xwe ve bıçe. Tê leqay meydanekê weri, lı meydanê yê ku nêçira nêçirvanan e, ew dıkare alikarıya te bıke.

Etana bı riya xwe ve çûye, gıhıştıye meydana nêçirvanan a ku nêçir tên agırbarandın. Dı meydanê de Qertel dırêjkıri bûye û lı hêvya mırına xwe bûye. Gava Etana ew ditiye, nızanibûye ku dê Qertel çawa alikarıya wi bıke. Etana disa ji xwe berdaye meydanê, bırinên Qertel dermankırıne, xwarın û vexwarın dayê û lı ber serê Qertel ma ye, da bıbinê - dê çı çêbıbe.

Roj lı pey rojan Qertel hêza xwe ya berê gırtiye. Bırinên wi ber bı rehetbûnê ve çûne. Lê disa ji Etana nızanibûye dê çawa Qertel alikarıya daxwaza wi bıke û bı vi awayi, dê bıbe xwedi zarok.

Şevekê Etana xewneke ecêb ditiye. Dı xewna xwe de ditiye ku bılındi ezmanan dıbe. Lı ser kursıyê ku şêr dı bın de dırêjkıri ne, Xwedêya evinê Işţar bı xwe rûnışti bûye. Ezmanên ku Işţar xwedıyê wan ji bûye, lı derdora Işţar şinayıya xwe ya cıwan û xweşık belavkırıbûn e. Dı nav vê şinayıyê de, çavê Etana lı nebata ku dıxwaze û muqades e ketıbûye. Etana dı xewna xwe de gıhıştıye kêfxweşıyek gelek mezın. Daxwaza wi bıcih hatıbûye. Lê gava şıyar bûye û ditiye tıştên diti xewn bûn e û her tışt lı derdora wi weki berê bûye, kêfxweşıya wi yekcar wenda bûye

- Tu çıma weha bı keder i? Qertel jı wi pırsiye.

- Nuha ez dızanım lı kudê, ezê nebata jı mın re pêwist peyda bıkım, da daxwaza mın û jına mın bıcih bê - Etana lê vegerandiye - lê ez nızanım çawa ez bıgıhijım wê. Jı ber vê yekê ji dı mala mın de, ne zarok dê jı me re çêbıbe, ne ji kêfxweşi dê bıkeve mala me.

Weha Etana dest pê kırıye, da xewna xwe jı Qertel re gotıye:

- Etana - Qertel gotıye - ez riya ezmanan dınasım. Bı hezarên caran dı bılındayıya ezmanan de ez fıri me. Ger tu bıxwazi, ez ê te bıgihinım bılındıya heri jor a ezmanan. Jı bo ku tu bıbe xwedi nebata, ku tu xeyala wê dıki. Xwe bı serzıki dırêj bıke, pışta xwe bıde ber sınga mın, jı cihê ku baskên mın derdıkevın bı destên xwe, xwe baş bıgre. Bı hevre emê jı erdê bılınd bılınd bı jor kevın.

Bı dılgeşi Etana guhdari lı peyvên Qertel kırın e. Çawa ku Qertel gotiye, Etana ji weha kıriye. Gava Qertel ditiye Etana xwe baş gırtiye, baskên xwe lêxıstıne û bı jor ve fıriye. Ber bı bılındiya ezmanan ve çûye.

Bı tırs Etana lı erdê temaşe kıriye. Bı ser gund û bajaran ketın e, her tıșt lı erdê bıçûk û bıçûk bûye.

- De bêje xwediyê mın - Qertel gotiyê - erd çawa weki gırek bıçûk xuya dıke û derya weki çemeki bıçûk.

Qertel baskên xwe bıhêztır lêdane. Ew û Etana bı jortır ketıne .

- Bınêre - Qertel gotiye - xwediyê mın, nuha ji derya weki cokek avê diyar dıbe.

Qertel baskên xwe disa lêxıstıne û gotiye:

- Erd ji weki darıstanek bıçûk xuya dıke, ne weha xwediyê mın?

Hewqas bı jor ketıne ku erd weki lıbek genım ber bı çavê wan bıçûk bûye û derya bıqasi dılopek baran bıçûk ma ye. Û paşi tıştek jı wan ji nemaye... Tenê valayiya ezmanan lı derdor, lı bın û lı jori wan diyar bûye. Gava Etana bala xwe daye û ditiye ku lı derdora wi tenê valayi heye, tırs ketiye dılê wi.

- Raweste, tıştek lı derdora me nine, de ka em vegerın - Etana gotiye - Ez dıxwazım em vegerın erda xwe.

Qertel ê ku fêri bılındiya ezmanan bûye, bê tırs lı xwediyê xwe vegeriyaye û gotiye:

- Tu çı dıbêji ya xwediyê mın? Em gıhiştıne hema hema bılındiya heri jor a ezmanan, hınek ma ku daxwaza te ya heri mezın bıcih bıbê û tu dıxwazi em vegerın, çawa dıbe?

- Zû, zû vegere - Etana dûbare kıriye - Zû vegere cih ê ku em jê hatın.

Etana jı tırsan lerıziye. Xeberdanên wi ji, jı devê wi bı zor derketıne. Jı vê tırsa mezın çavên xwe gırtıne û pê hısaye ku destên wi qurumi ne. Destên xwe berdan e... û jı valayiya ezmanan a heri jor ve ketiye.

Qertel bı lez daye dûv ku bıgihê, da wi xelas bıke, lê negıhıştiye Etana. Kesê ku jıyan daye wi, ew bı xwe jı jıyana xwe bûye.

Erd a ku jıyan daye Etana, weha ji, jıyana wi jê şunve gırtiye. □

# Jı bo xatırê xwendevanan



Jı pêşniyazên rojnamevanê navdar Sigge Ågren:

## "Hêsan bınivise ku rehet bê xwendın"

*"Jı bo xatırê xwendevanan" navê kompendiumeke rojnamevanê swêdi Sigge Ågren e. Ågren bı salan wek şef-redaktorê rojnameyeke mezın (Expressen) xebıtiye. Dı diroka rojnamegeriya Swêdi da naveki pır naskıri ye. Wi pışti xebata xwe ya salan, zanin û tecrubeyên xwe dı pırtûkeke pıçûk da kom kırıye û daye weşandın. Ev berhema wi wek materyaleki dersê, dı zaningehên bılınd da, dı beşê zımanê swêdi û rojnamevaniyê da ji tê xwendın. Têda jı bo kesên nıvıskar, rojnamevan û her keseki ku dıxwaze merema xwe nıvıski bine zımên, gelek şiret û agahdariyên kêrhati hene.*

*Ågren jı peyvan bıgıre heta hevokan, jı sernıvisa mıqalekê bıgıre heta şêweyên nûçe nıvisandınê gelek mıjarên cuda dıgıre destê xwe û şırove dıke. Lı vê derê herwısa pırsên rêzmanê ji ciheki gırıng dıgırın. Nıvıskar bı gelek nımûneyên cuda va ditınên xwe raberi xwendevanan dıke. Ew dı dawiya pırtûkê da ditın û şiretên xwe bı kurtebıri dıcıvine ser hev û pêşkêşi meslektaşên xwe dıke. Me beşeki wê wergerandıne kurdi û lı vê derê pêşkêşi xwendevanan dıkın. Tevaya pırtûkê me wernegerand jı ber ku pıraniya nımûneyên wê jı rojnameyên swêdi hatıne gırtın, û dı gelek halan da xusûsiyetên zımanê swêdi tên şıroveкırın.*

*Dıgel vê em bı fırehi cih dıdıne ditın û agahdariyên ku wi derheqa dırêjaya hevokan da nıvisine.*

*Em wısa hêvi dıkın ku gelek rojnamevanên kurd yên nûgıhişti jı wê bıkarıbın jı zanin û tecrubeyên vi meslektaşê xwe kelkekê wergırın.*

# 10 şiret jı bo kesên nıvıskar û rojnamevan

**1- Dıvê tu jı xwe zehftır jı xwendevanê xwe hez bıki!**
Jı bir neke ku tu jı bo xwendevan dınıvisi. Ne jı bo xwe û hevalên xwe.

**2- Dıvê tu peyvên (kelime, bêje) xwe rast bıbıjêri!**
Jı bir neke ku peyveke kurt jı yeke dırêj çêtır e, dema herdu ji dı eyni maneyê da bın.

**3- Hewcedariya bihngırtına xwendevanan wek pirozbahiyeki qebûl bıke!**

Jı bir neke ku danina noqte (.) ne tıştеki fedikırın û şermê ye. Hevoka (cumle) ku xwendına wê hêsa ye, kêm caran jı 20 peyvi zêdetır dıbe.

**4- Şerefa zımanê maki yê xwendevanên xwe bılınd bıgre!**
Peyvên wısa bı kar bine ku xwendevanên te jê fehm bıkın. Gotın û peyvên zımanê maki tercih bıke.

**5- Hewes û interesa xwendevanan neşkêne!**
Hina dı destpêka nıvisê da bala xwendevanan bıkışine ser nıvisê. Lê dûra ji mıqala xwe bı gotın û hevokên vala û bê agahdari newerımine.

**6- Fıkran lı hevdu sıwar neke!**
Bıla dı nıvisa te da fıkır lı hev sıwar nebın. Berê fıkreki temam bıke , paşê dest bı yeke dın bıke. Eger gelek tıştên te yên gotınê hebın, tevi dı carekê da nebêje.

**7- Berê bı xwe baş hin bıbe paşê bınıvise!**
Jı bir neke, xwendevanên te bı gıştı ne pıspor ın. Loma peyvên pısporiyê yên ku tu bı xwe ji maneya wan baş nızani bı kar neyne.

**8- Xwe jı şahıdiya sexte dûr bıgre!**
Dıvê hertım dı bira te da be, ku tu wekilê xwendevanên xwe yi. Xwendevanên te dıxwazın bızanıbın ka çı qewımiye. Ne ku tu çı texmin dıki.

**9- Jı şexsi-bûyinê netırse!**
Dı nıvisê da xebıtandına pronavên şexsan wek ez , tu, ew, em, hûn, ewan serbest e.

**10- Jı guhdarikırına xwe netırse!**
Dema ku tu nıvisa xwe jı xwe ra bı deng bıxwini, ev dıkare alikariyeke mezın bıde te. Hıngê tu dıkari peyv û hevokên zêde û bêkêr jê derxini.

## Lı ser hevokên kurt û dırêj:

(..)
Hevokên (cumle) dırêj zû dıkarın tevlıhev û aloze bıbın. Loma dıvê tu baş diqet bıki eger mêyla te lı ser nıvisandına hevokên dırêj be. Dı nıvisarekê da dırêjaya hevokê = jımara bınavınci (ortalama)ya peyvan ku jı serê hevokê ra dıkeve, sal bı sal dı gelek zımanan da kêmtır dıbe. Ev guhartın bı pêşketın û belavbûna xwendınê ra dıqewımе. Lêkolinan heta nuha ev tışt nişan dane.
Va ye jı te ra şêweyeki pivandınê: Dema ku hevokên te bınavınci jı 19-21 peyvên dırêj derbastır kır, dıvê haya te jê hebe ku tu hevokên xwe aloze dıki.
Ku tu hevokên xwe zêde kın bıki û daxini bınê bınavınci 10 peyvan, ew ji nebaş e. Tu disa jı xwendevanan ra dıjwariyê derdıxini.
Vi qaideyi jı bira xwe dernexe, ew ne tıştеki beredayi ye.
Hevokên dırêj, eger bı mantıqi hatıbın lêkırın, dıkarın ritim û guhartınê bıdıne nıvisa te.
Hevokên pır kurt, xasma dı destpêka nıvisê da dıkarın hêz û balkêşiya nıvisê zêdetır bıkın.

**Mırov dıkare dı nıvisekê da dereca**

**zorbûna xwendınê bıpive**

Mırov dıkare bıpive ku xwendına nıvisekê çıqasi zor e. Hina dı salên 40-i da zımanzaneki amerikani barometreke xwendebariyê çêkır. Lı gor wi dırêjbûna peyvan û hevokan, bı awayeki mekanik xwendına nıvisekê dıjwar dıke. Lê vê barometrê derbari jê serwaxtbûna nıvisekê da tu agahdari nedıda.

C H Björnsson lı Navenda Pedagojik ya Stockholmê dı salên 60-i da endekseke xwendebariyê a nuh hazır kır. Lê ew ji dırêjaya peyvan û hevokan wek bıngeh dıgıre.

Eger tu bıxwazi xwendebariya nıviseke xwe, yan ji mıqaleyeke xwe bıpivi, dıkari vê endeksê bı kar bini. Bı vi awayi tê bıkarıbi nıvisa xwe kontrol bıki da ku dı destpêkê da bı şêweyeki zor nenıvisi. Lê helbet tu nıkari tıştên fakta û beşên dın yên muhim bı vi awayi bıpivi.

## Weha bıke:

Eger jı bo nıvisên kurt be (ku jı 1000 peyvi zêdetır nebe) hıngê tu dıkari tevaya nıvisê bıpivi. Nıvisên dırêj ji tu dıkari parçe-parçe bıpivi.

**a)** Bıjmıre çend peyv hene. Jımar û kurtaya peyvan ji wek peyv tên jımartın. Mesela 1632 peyvek e. Kurtayi jı hev tên cudakırın. Ûhwd (û her weki dın) dıbe çar peyv, lê peyvên wek DAY ku peyvên sertip ın (Dewletên Amerikayê ên yekbûyi) wek peyvekê tên jımartın. Du peyvên ku bı xêzıkê (-) bı hev va hatıne gırêdan ew ji wek yek peyvekê tên jımartın (swêdi-ingilizi).

**b)** Peyvên dırêj bıjmıre. Yên ku jı şeş tipan (herf) zêdetır têda hene, ew wek peyvên dırêj tên pejırandın. 20 (bist) peyveke kurt e. 15 (panzdeh) peyveke dırêj e.

**c)** Jımara peyvên dırêj lı ya temamiya peyvan parveke. Paşê bı 100-i va lı hevxe. Ev wê jımara jı serê sedi (%) ya peyvên dırêj bıde xuyakırın, ku ew ji pivaneke baş e bo diyarkırına dırêjayiya peyvan (**dp**).

**d)** Hevokên nıvisê bıjmıre.

**e)** Jımara temamiya peyvan lı ya hevokan parveke. Ev ji bınavınciya dırêjayiya hevokan (**dh**) dıde (jı serê hevokê ra bınavıncı çend peyv dıkeve).

**f)** **Dp** û **dh** lı hev zêde bıke. Yekûna wan bı jımara grover bınıvise. Ev qimeta dı destê te da xwendebariyê diyar dıke. Em jı vê jımarê ra dıkarın bıbêjın "Xwendeks". Te nıvisa xwe lı xwendeksê xıst.

### Xwendeks weha tê şırovekırın:

| Xwendeks | |
|---|---|
| 20-25 | **Pır hêsa,<br>wek dı pırtûkên zarokan da.** |
| 30-35 | **Hêsa.<br>Dı hın nıvisarên edebi da.<br>Nişaneke baş e bo nıviskar.** |
| 40-45 | **Nivçe.<br>Eger xwendeks jı vê bılındtır bıbe, hıngê gelek kes wê bı dıjwari bıkarıbın bıxwinın.** |
| 50-55 | **Zor.<br>Bêtır dı nıvisarên resmi da.** |
| 60 | **Pır zor** |

***Werger jı swêdi: Haluk ÖZTÜRK***

# Çend gotınên bıjarte...

Xırabiyên mırovan lı pıştı wan ji dıjin; lê qenciyên wan gelek caran bı hestûyên wan va tevayi tên çalkırın.
*WILLIAM SHAKESPIR*

Yê ku kakıl bıxwe, qalık dışkêne.
*TITUS PLAUTUS*

Bı esalet fıkrin zor e, dema mırov tenê bıfıkıre ku wê çawa bıkarıbe bıji.
*JAN-JACQUES ROUSSEAU*

Pirbûn (kalbûn) ne huner e. Huner pir mayin e.
*J. W. VON GOETHE*

Heneka zırav bo merıvê kamıl e.
*KEMAL BURKAY*

Ker gulê naxwe, ne jı keriyê ye; dızane ku gul bo bihnkırınê ye.
*KEMAL BURKAY*

Edebiyat gula bı stri ye, siyaset striya bı gul e.
*KEMAL BURKAY*

Jı xeletiyên xelkê ders bıgıre, çımki emrê te têrê nake ku tu bı xwe hemû wan xeletiyan bıki.
*MARTIN VAUBEE*

Dıvê mırov xwe fêr bıke ku rastiyê dı tıştên piçûk da bıgere, eger ne wısa be, mırov wê dı yên mezın da xeletiyên esasi bıke.
*VOLTAIRE*

Hunera bêzarkırınê ew e ku yek behsa her tışti dıke.
*VOLTAIRE*

Jı bo berazê teral her dem erd qerısi ye.
*GOTINEKE PÊŞİYAN A SUMERİ*



Tu wextê kıtêbên xwe bı deyni nede kesi- jı ber ku kes wan paşda lı te venagerine. Pıraniya kıtêbên ku nuha lı ba mın hene, ew ji ew kıtêb ın ku dost û nasan bı deyni dane mın.
*ANATOLE FRANCE*

# FEQİYÊ TEYRA Û

# AVA MEZIN (2)

Berhevkar A. GERNAS

Gava Feqe av jı cih rakıri
Lê şal û eba jı mıla kıri
Serqot û ew pêxwas kıri
Berê wi daye hışetê

Çaxê Ava Mezın ev yek kıri
Feqe bê serûber kıri
Pêla pêşi lı Feqe zıft kıri
Berê wi daye xurbetê

Çaxê avê dıgo ey Feqê reben wey musteil
Sed weki wek te xazi û şehid
Mın lı van newal û wan besta kırıne qetıl
Lê teyran dane xesaretê

Avê gazi Feqe kır û go : "Feqeyo, rebeno, feqiro!.. Sedê weki te dı şeran da şehid û xazi bûn, mın wan dı nava xwe da xenıqand û kırıne qısmetê teyr û masiyan. Ica iro tu bı vi aqılê xwe hati û forsê lı mın dıki..."
Feqe serav û bınav bû, av çû nava wi, ket haleki nehal. Êdi bêçare hewarê gıhand Xwedê û teyran. Teyr ji, lı ser çiya, lı ser zınareki raseri avê ketıye temaşa avê û Feqe dıke.

Feqe dıke hewara van teyra van tûtiya
Lê teyrık gıri lı serê çiya
Teyra bang kırın masiya
Lê herıne ziyaretê

Teyran bangi masiya kır û gotıne wan: "Herın ziyaretiya Feqe, wi yewaf bıkın. Lê hûn dev navêjın wi, goştê wi nexwın. Bı navê Xwedê eger hûn zırarek bıgıhinınê, em ê we bıqelinın!.."

Teyra gote masiya, go, laşê Feqe xera mekın!
Lê hesti û reha jı hev qut mekın
Bê dewr û bê yasin mekın
Da xelk jê bıkın menfietê

Çıqas avê bangi masiya kır û got : "Gıdi va

mın wi jı we ra avêtıye gerinekê, jı we ra rızqê we aniye ber devê we!.. De bıxwın, hûn çı sekınine!.." Masi newêrın xwe nêzi Feqe bıkın û dıbên : "Em eleqa xwe jı Feqe naynın." Ava mezın ji, hısa teyra dıke ku çı jı masiyan ra dıbêjın.

Avê dıgot Feqi jı ku ye
Yan Muksi ye, ê jınbi ye
Mıhacır e, jı jor hatıye
Masino herın ziyafetê

Av jı masiyan ra dıbê : "Guh nedınê, ez zanım jı ku ye!. Bêxwedi ye, Itênısi ye. Pireka wi ji, jınbi ye, zarokê wi ji tune ku bêne hewara wi. Mıhacır e, jı welatê jor hatıye. Wa mın ew lı erdê daniye, bıxwın, texsir mekın, gunehê xwe pê neynın!..

Gava Feqe lı xwe dıfıkıri
Ser hıldıda ser dıgıri
Dıgot, yareb em şakıri
Jı te dıxwazım qewetê.

Xweda dı cih da himmet kıri
Ava Mezın hefsar kıri
Feqe jı avê derbas kıri
Hûn guh bıdın vê hikmetê

Feqe lıngeki xwe avêt vi mıli yek ji avêt wi mıli û got : "Avê! de ica were mın, tu bêmınet i...

Gava Feqe lı qamê dıda
Lê pêla pêşi lı navê dıda
Sed şıkır û ahda dıda
Go, xılas bıbım jı vê eziyetê

Avê got : "Ez ica ketıme eziyet û belayek mezın. Nema dıhêle ez bıbuhurım ji.." Av tê û lê dısekıne. Feqe wek bendeki lı pêşiya avê sekıniye. Av çıqas tê û pêlên xwe xurt dıke, feyde nake. Av û pêlên ku tên, dıcıvın û nıkarın jı Feqe derbas bıbın, wısa bılınd dıbe ku serê avê dıgıhije erşê Xweda.

Ava Mezın xwe lêk dıda
Lê pêla beri lı ba dıda
Hemûya pêk va hıcûm dıda
Pêla hat û lı çoka dıda

Gava Feqe lı avê seyıri
Lıngek jı vır da wi mıli
Dıgo, avê were eger tu qabıli
Dom ke em bıkın eşireti

Got : "Avê, de ica were. Eger tu mêr i, eger tu berberê mın i em ê bı eşirki herın hev!.."

Gava Feqe lı avê rıkıni
Pêla pêşa hat û lı Feqe sekıni
Feqe gote, avê mı tu berberê mın i
Wer de em bıkın mucadeletê

Av dı halê xwe da şaş û mat ma, sekıni û nıkarıbû bıbuhure. Av dı halê xwe da keliya, gazi pêlên paş kır. Pêla ku hat lı çokên Feqe qelıbi, nebuhuri û cardın paş va vegeriya. Her pêla ku paş va vegeriya jı ya dû xwe ra got: "Va ye hukmê mın betal bû, ka tu herê, ka em bıbinın tê çı bıki.."

Pêla pêşi dıgot ya paş
Lê esker bıgır taze bıkêş
Feqeh bıgır jı cih bımıj
Bavêjın diyarê xurbetê

Pêla paşi dıgot we ye
Lê ne bı henek e ev Feqe ye
Ma ew kelha mirê me ye
Talan bıkın vê saetê

Go : "Welle eger Bırca Belek bûya ji, Mirê Botan bûya ji me yê dı cih da wi bıfetısanda. Lê evya jı kelha Mir ji zêdetır e, jı hukmê me ketıye, em nıkarın."

Jı kelha Miri zêdetır e
Lê jı hezar hosta zanetır e
Sed rêz pêk ve lê kıri
Lê sıkrek daye nû vê şêti

Hukmê pêla betal bû, ica Ava Mezın xwe da pêş. Pêl jı ava nerm ra dıbên : " Tu dı bınê piyê wi bıkole, wê şaxê em ê cardın êriş bıkın û ka bınıhêrın belki ica karıbın tıştek jê bıkın."

Avê got, mın xef bıkın, mın xef
bıkın
Hûn dom kın Feqe mıjûl bıkın
Kuçki jı mın ra jı bınê piyê wi hıl
bıkın
Da wi belav kır vi şeti

Feqe got, tevr û kulıng bêfeyde ne
Lê ez wek hesınê tûtya bı xwe me
Tu car ev ne karê te ne
Hezar jı senayê qudretê

Jı nû Ava mezın lı hev fetıli
Pêla çû da serê geli
Teyrık jı ser daran fıri
Dan wesfên Rebbê Izzetê

İca av bı ser çiyayê Botan ket, gıha heta bınê hêlinê teyran. Teyr jı hêlinên xwe fırin. Vi qasi Feqe jı avê ra got : "De ka em bıbinın, huner û marifetên te çı hene nişan bıde da ku bıkarıbi derbas bıbi..."

Feqe got, Ava Mezın bes
bıhumhume
Demkê rûnê jı mın ra bıkılıme
Tu acız i şevkê rabe jı xewê
bınewıme
Lê bistki were istırahetê

Gava Feqe van gotınan jı avê ra got, Ava Mezın dı nava xwe da keliya û gıriya, ne êdi hew kare here Feqe. İca av gıliyê wi lı ba Xwedayê alemê dıke.

Ava Mezın rûnıştgıri
Rebbê mezın gazi avê kıri, "qey tu
dıgri?"
Avê dıgot, ya Rebbi, vi zalımê ev
yek kıri
Lê masi ketıne xesaretê

Xwedayê alemê dıbê : "Avê, ma tu çıma dıgri?" Av dıbê: "Ya Rebbi, ma tu nabini ku vi zalımê çı jı mın dıke. Zulmê lı mın dıke, masi temam lı beji man, helak bûn çûn!.."

Ya Rebbi, ev zalım e ne feqe ye
Lê ne alım e, cabır bı xwe ye
Bû manıê hukmê te ye
Lê pêk nayê işê ummetê

Pışti gıli û gazınên Ava Mezın :

Rebbê mezın mızgin dıde
Jı bo avê cewab dıde
Lê mın destûra Feqe dıda
Jê ra bıke riayetê

Lewra Feqe her dılkul e
Lê jı tırsa Xwedê her çavşıl e
Xweş mamûr e pır zakır e
Lê belki lı te bê rehmetê

Xwedê şireta lı avê dıke û dıbê : "Mın destûra Feqe daye, lewra ew tım dı emrê mın da ye, tırsa mın hertım dı dılê wi da ye û her wısa ji mamûreki mın û hêja û zana ye. De ica tu jê hêviya bıke ka belki rehım bıkeve dılê wi, eger rehım lı te neke mın izna wi daye, ew çı bıxwaze wê jı te bıke.."

Jı nû avê dıgot, Feqiyê delal
Gori te be Rostemê Zal
Te ez hiştım her kerr û lal
Lê hêvi dıkım jı te rehmetê

Ava Mezın jı nû va bı siyasetê çû Feqe û got : "Mın nızanıbû tu ev pêlewan i, tu ev mêr i, ev ewliya, ev qencê ser nebiya yi... Vêca mın hêvi heye ku tu izna mın bıdi da ku ez bıborım. Eva mın tobe lı ber destê Xwedê û destê te ku ez nehêlım deng jı nava mın bê. Lewra tu dıbêji, ev deng jı ku derê te tê? Ne destê te, ne lıngê te, ne çengê te û ne ji perê te, ev deng jı ku derê te tê? De tu were lı mın bê rehmê da ku ez bê deng bıborım."
Feqe dıbêjê : "Na, ew tıştê ku tu dıbêji naqewıme."

Feqe got, Ava Mezın tu hêviya
meke
Tu siyaset û lêvıka bı mın meke
Paşi vegere xwe kar bıke
Disa here şikayetê

"Tu bı van siyaseta nıkari mın bıxapini. Here, vegere ba Xwedê û şikayeta mın jê ra bıke. Bêje, evya ne Feqe ye, ne alım e, bêje ev zalım e.., tu çı dıki tu bê mınet i." dıbêje Feqe.

Şikayet bıke sed bê bıke
Sed cıld kıtêb zêde bıke
..............................
Tu here şikayetê

Paşi vegere mın acız meke
Jı kani û çem û newala dengki xwe bıke
Keviyê berfê, zozanê bani xırab bıke
Lê tu hındıki were em çêkın vê weqeetê

Avê got, Feqiyê delal ez aşıq ım
Lakın çı bıkım ne natıq ım
Ez mamûrê emrê Xalıq ım
Ax û fixanê muhbetê

Got : "Feqiyê delal, ez aşıqê cemala Xwedê me, lê ez çı bıkım iro feêek lı serê mın geriyaye. Jı roja ku dınya ava bûye heta iro, mın bı tu kesi ra xeber nedaye. Ica kêfa mın jı te ra hat û mın got, de Feqeyeki ye, hema ez ê pê ra du gotın xeber bıdım û bı riya xwe da bıborım. Ez ji, dı bın emrê Xwedayê alemê da me. Ev nalina ku jı mın tê, temam jı muhbeta Xwedê ye. De ica izna mın bıde da ku ez bı riya xwe da herım û bıfıkıre ku nıha ax, bax û baxçe, fêki û dar û ber mane beji!.."

Feqe dıbê : " Na, eger ez izna te bıdım, dıvê tu weke werisê şehlê dı nav piyê mın ra heri û bıbori!.."

Ava Mezın peşko peşko dı nav paqê wi ra dıbuhure heta ku sawi dıbe. Jı ber vê yekê Ava Mezın nıha ji, dema ku dıbuhure û dıçe bêdeng e.

***Dawi***

□

# KOMELA NIVİSKARÊN KURD LI SWÊDÊ HAT DAMEZRANDIN

Gelek nıviskarên Kurd ên ku lı Swêdê dıminın, demek berê dest bı xebata xweorganizekırınê kırıbûn. Nıviskarên Kurd dı çend cıvinan de pırsên xwe munaqeşe kırın û 22. 1. 1995'an de bı kongra damezrandınê **Komela Nıviskarên Kurd lı Swêdê** damezrandın.

Lı ser pêşniyarên beşdaran, kongrê jı bo sekınandına şerê navxwe yê Kurdıstana Başûr û jı bo protestokırına ta'de û neheqiyên ku lı Tırkiyê lı nıviskar Yaşar Kemal dıbın, du beyanname belav kırın.

Herweha kongrê qerar da ku jı ali Komela Nıviskarên Kurd lı Swêdê kovarek bête weşandın.

Dı kongrê de ev kes jı bo komita kargêr ya Komela Nıviskarên Kurd lı Swêdê hatın hılbıjartın:

*M. Malmisanıj, Munzur Çem, Naci Kutlay, Ahmet Cantekın, Nedim Dağdeviren, Osman Aytar, Mahmûd Lewendi.*

## JI DİWANA NÛ YA

# Ferhad Shakely




*Qapaxa pêşin ya pırtûka Ferhad Şakeli "NİGARİ TO LE DİWARİ ZİNDANEKEM HELDIKOLIM"*

*Diwaneke nû ya şaırê kurd kak Ferhad Shakely (Şakeli) van rojan derket. Me jê tika kır ku ew bı xwe çend şıêran jı tipên erebi transkribeyi latini bıke û jı bo xwendevanên Roja Nû bışine. Wi daxwaza me bı ci ani, em jêra spas dıkın û jı bo kıtêba wi ya nuh wi piroz dıkın.*

## Kêwi Dıl

Kêwi dılım
ba tişki aşınayit roşın kewe,
dıl u gıyan
dekeme berdebazi rêgeket.
Way, ke bêtoyi çı salanêki şewzeng e,
wey ke şari gıyan,
bê yadi to,
çı gorrê, çı gorrıstanêki bêdeng e.

1988

## Kırrêwe

Le xewn u le bêdarimda her dêmewe benderi aşınayit,
tozi rêgey reqeni salani bêbarani
le kakolım bıtekêni.
Xwêni wışkewebûy ser yali espekem depırwênım,
ba kes be razi serhelgırtınekem nezanê.
To pey bem derde bê-amanem debeyt;
rengzerdıyekem lêt rûn e, xo, ke dûriy aziz e.

Tinwêti seretay gerranewem bû, leser sınûri
wılati şew
taci pışkorrengi tırsım dagırt.
Le henasey gulrrengi berbeyana nêrgısecarrê deşınawe,
tasey didarıt bû. Bêdengim dekewte gırrugal, sayey

mergım le debuwe hewrêki baranawi, le gel helkışan u dakışani şepoli cawerranimda debûme rûbarê rojgar u debûme zeryayê zeman.

Dengım le dûy dwayin hewari zayeleyeki koçeri debête bıncıkeki xolawi, le gwê rêgeyeki kwêrewebûda reg dadekutê, debête zengoleyeki jengawi le baweşi xamoşida, wırde wırde, goraniy mergi leser zare w xoy desûtênê.

Le dûrewe detbinım, halawi rengawrrengi
deştêki şorekati,
le nêwan "Ezel" u "Ebed" da berdebaz e,
wırincet dê
Em tarikiye şêdarey hemû werzêkım
be kırrêwey zıstanan derrengênê, buwar nada...
buwar nada destêki gızıng bêt u
derûyek lem qefesi nadılıstane bıkatewe.

London 8/3/992

## Dêytewew birım


Le germey bezmi bedmestima dêyetewe birım,
tezûyeki êşamêzit serapêy hestim
be xwêni dılekem rengdar dekey,
dêtewe birım em sere sewdaye,
bê yadi to, karwanserayeke , ne kesê, ne nakesê rûy tênaka.

Çı razêke em derdey naynasım u
herfêki lê nayête ser zımanım.
Çı derdêke em raze yektayey
her nawi nawinişi nazanım.

Sollentuna 13/2/1989

**"Jı bo Azadiya fıkırê û mafên çandi yên minoriteyan"**

# Lı ser "Projeya Behra Reş" û rewşa çanda kurdi..




*Xalıt LEZGİN*

Jı 30 welati bı qasi 400 nıviskar û wergerên mıletên cuda jı bo pıştgıriya *"Azadiya fıkırê û mafên çandi yên minoriteyan"* hatın ba hev. Wan dı navbera 14 û 23'ê Mıjdarê da lı ser Behra Reş bı gemiyê tûr avêtın. Bı rojan lı se van pırsa nıqaş kırın. Dı nav wan da sê nıviskarên kurd ji hebûn.

Ev ger, lı ser pêşniyar û insiyatifa Yekitiya Nıviskarên Swêdê pêk hatıbû. YNS bı navê **"Projeya Behr Reş"** salekê pêşda dest bı amadekırına projeyeke weha kırıbû. Bı insiyatifa Yekitiya Nıviskarên Swêdê hevditına evqas nıviskar û wergerên neteweyên cuda wek serfıraziyekê tê pejırandın. Lê bêdengiya lı ser rewşa çanda kurdi disa ranebûbû... Gelo çıma? Me ev pırs ji du nıviskarên swêdi kır...

WERGERA SWÊDI ·

## İNGER JOHANSSON:

**- Pırsa kurdi hema hema qet nehat nıqaşkırın. Bıli çend gotınên gıştì, zordestiya ser kurdan bı tu bıryarên resmi nehat protestokırın. Lı gor mın û gelek kesên dın ji, bêdeng mayin bû ev.**



ROJA NÛ: *Jı 400 werger û nıviskarên beşdar yek ji tu bûyi. Û dı kovara" Forfattaren"da te bı gazın qala bêdengiya lı hember rewşa gelê Kurd kıriye û nıvisiye. Wısa diyar e ku te bı tenê acıziya xwe daye xuyakırın. Gelo nıviskarên dın, haya wan tune lı ser rewşa kurdan?*


**İ. JOHANSSON:** Helbet kesên ku

⇒

SEROKÊ YEKITIYA NIVISKARÊN SWÊDÊ

# PETER CURMAN:

## -Helbet zordestiya lı ser zıman û çanda kurdi me teva eleqeder dıke



ROJA NÛ: *Derbari rewşa gelê kurd û zordestiya ser çanda kurdi da gereke hûn baş agahdarkıri bın. Ne wısa ye? Jı ber ku gelek endamên kurd hene dı nav we da...*

PETER CURMAN: Erê. Ez dıxwazım pêşiyê bı çend vi tışti wek bêdengiyekê qebûl dıkın û rexne dıkın, ne tenê ez ım. Pışti ku Fırat Ceweri helbestek xwend û mın ew wergerande ingilizi, dı *êvara helbesta tırki* da mesela mın bı Amy Mims ra, jı Atinayê ye, qıse kır. Ew geleki acız bûbû ku çıma zêde qala kurdan nehatıbû kırın. Ew baş agahdar bû lı ser rewşa kurda, lê yên dın ne wısa bûn. Bı gışti mırov dıkare bıbêje ku iskandinavi û kesên jı Ewrûpa roava, jı yên rohılatê bêtır halê kurdan dızanıbûn.

ROJA NÛ: *Te dı nıvisa xwe da pırs kırıbû, nuha em ji eyni wê pırsa te jı te bıkın: Gelo sedemê vê bêdengiyê çı bû. Çıma dı projeyeke weha da, dı nıqaşên ser "hurmet jı bo huwiyeta çandi" da politika Tırkiyê nehat nıqaşkırın?*

**I. JOHANSSON:** Pêwist bû pırsa kurdan qet nebe dı nıqaşên ser azadiya ifadeyê û mafên minoriteyên kulturi da bıhata nıqaşkırın. Bêşık xên jı mın gelek kesên dın ji lı benda vê yekê bûn. Dı nav delegasyona swêdi da her kes dı wareki da xwedi berpırsiyariyekê bû, û helbet me ji hêvi dıkır ku Mehmed Uzun, ku endamê Komita Rêvebır ya Yekitiya Nıviskarên Swêdê ye, hewl bıda da ku pırsa kurdi dı şertên munasib bıaniya cıvinê û lı ser xeberda. Heta nuha ji tu şırovekırıneke têrker nehatiye dayin ka bo çı ev tışt pêk nehat. Her tışt bı wê va gırêdayi ye ku her kesek bı berpırsiyariya xwe va rabe. Herweha dıvê bê gotın ku rewşa Tırkiyê ya dagırti lı rewş û atmosfera hundırê gemiyê ji tesira xwe dıhişt û ku em çûn wır û me İstenbol û İzmir ji ziyaret kır û Peter Curman dı TV a tırki da qısekır, ev tıştana yekser wek pıştgıriya mafên mırovi hat pejırandın, herwısa ji bo mafên kurdan ji.

ROJA NÛ: *Tırkiye lı hember 20 milyon kurd siyaseteke asimilasyonê ya geleki dıjwar dajo. Bı* ***Behra Reş*** *ra sinorê heri dırêj yê Tırkiyê ye. Û yek jı armancên* ***"Projeya Behra Reş"*** *ji ew bû ku jı naskırına huwiyeta çandi ya gelan ra xızmet bıke. İcar ev hıneki gayri cıddi nine ku lı dıji zordestiya ser kurdan tu beyan û dazaneke resmi derneket?.. Ditına te çı ye?*

**I. JOHANSSON:** Bıli Deklerasyona Delfi (qısmen dı kovara F. 8/94´an da hatiye nıvisandın) dı vê gerê da tu bıryareke resmi nehat standın. Lê jı hemû serokên dewletan ra nameyek hat şandın ku tê da bı gotınên gışti lı ser azadiya ifadeyê û rêzgırtına huviyeta kulturi tê behs kırın, her wısa tê daxwazkırın ku her ki bıxwaze azadiya xwe ifadekırınê bı kar bine, jı bo jiyana wan tevdirên ewli bê garantikırın, û yên ku ev azadi jı destê wan hatiye standın disa lı wan bê vegerandın. Ez yek jı wan bûm yên ku ev name hazır kırın û bêşık ew beri gışkan bona kurdên Tırkiyê derbas dıbû. Disa nameyek ji jı serokwezir Çiller ra hat fakskırın, dı wê da me pırsa nıviskarên gırti pêşda ani û Beşikçi wek sembol hılbıjart. Orjinala vê û yek ji bı qasi 20 imzayên dın, me dı vegerê da poste kır. (Wek mın dı "Författaren" da ji nıvisibû, me tenê du nameyên bı tika (rıca) şandıne. Weki dın, çawa ku mın dı bersıva 2.´a da ji got dıvê her kesek bı berpırsiyara xwe va rabe.


ROJA NÛ: *Lı gor raya te, ronakbirên swêdi ji ne xwediyê berpırsiyariyeke pıştgırikırınê ne lı hember gelê Kurd ku evqas sal e lı dıji dewletên pır xurt şer dıke bona azadiyê?*

**I. JOHANSSON:** Wek mın qasek berê ji got, tenê tıştek heye ku em dıkarın jê hêviyê bıkın: her kes bı xwe berpırsiyariya xwe hılgıre. Hemû karên pıştgıriyê bı wê va gırêdayi ye ku ez û tu hewl bıdın desteki mırovtiyê dırêj bıkın. Çawa ku dı nıqaşekê da em lı ser hemfıkır bûn -dema ku disa gotın hate ser kurdan: gereke em ronakbirên swêdi beri her tışti cehd bıkın ku lı hukumeta xwe tesir bıkın heta ku ew ji Tırkiyê rexne bıke jı bo ku ew zordestiya xwe ya lı ser kurdan û yên dın rake.

gotınan behsa Yekitya Nıviskarên Swêdê (YNS) bıkım. Iro YNS êdi ne tenê yekitiya nıviskarên swêdi ye, ew multinasyonal e. Lı dor % 10 endamên me jı welatên cuda hatıne. Ew kesana jı ber sedemên cuda neçar mane welatê xwe terk kırıne. Dı nav wan da gelek kurd ji hene. Car-caran dı nav endamên me da tê gotın, ku YNS dı dınyayê da mezıntırin komela nıviskarên kurd e... Jı ber ku nıviskarên kurd tu wextê lı welatê xwe serbesti û mecalên xebatê û xweorganizekırınê neditıne. Bı vê yekê ra gırêdayi em lı ser rewşa kurdan agahdarkıri ne. Dı rêvebıriya YNS'ê da nıviskareki kurd, Mehmed Uzun cih gırtiye. Ev cara dudyan e ku tê hılbıjartın. Ango endamên komita rêvebır ji lı ser rewşa kurdan baş agahdar ın. Her wısa dıgel nıviskarên ku lı Kurdıstanê ne ji pêwendiyên me hene. Jı Kurdıstana Iraqê nıviskar hatın vır me hevdu naskır. Û niyeta me heye ku em ji herıne serdana (ziyaret) wan. Sala çûyi em ê bıçûna Kurdıstanê lê wê çaxê gelek tevlıhevi hebû; Ordiya tırka ketıbû Kurdıstana Iraqê, kurd bı xwe ji ne lı hev bûn... Ango em nıkarıbûn bıçûna. Lê em ê herın. Çûyina me wê ne tenê gera meraqê be, em dıxwazın bı proje û bı desteki alikariyê herın wır. Em ê jı wan ra kaxez temin bıkın û derxıstına kovereke edebi da pıştgıriya maddi bıkın.

Û bı riya kovara "Forfattaren" em ê dı derxıstına antolojiyeke şaırên kurd yên mıhacır da alikari bıkın. Ew antoloji jı ali M. Uzun va hatiye amadekırın.

Dıvê ez vê ji lê zêdekım; bı navê "Edebiyata jı sinoran der" programeke me ya seri heye. Me ew cıvin dı mala nıviskaran da kır û dıkın. Endamên me yên swêdi bı vi awayi hem nıviskar hem ji edebiyatên dereke nas dıkın. Lı gor ditına me ev geleki muhim e. Ev feydê dıde edebiyata swêdi ji. Çımki dema kulturên cuda leqi hev tên, tıştıne enteresant, ramanên kêrhati derdıkevıne meydanê.



**Wek Yekitiya Nıviskaran em amade ne ku jı bo mafên kurdan yên çandi şer bıkın.**

ROJA NÛ: *Dı "Projeya Behra Reş" da we lı hember zordestiya ser kurdan çı tıştên berbıçav kırıne?*

P. CURMAN: Gelek tıştên ku me dı vê gera xwe da kırıne, dı çapemeniya tırki da hatêne behs kırın. Ez kopyayên wan bıdıme te lê meze bıke. Me nameyek taybeti ku derbari rewşa nıviskarên kurd da bû, jı Tansu Çiller ra şand. Û dı çend munasebêtên cuda da me jı serkarên siyasi yên tırk ra nameyên protestoyê şandın. Jı ber ku azadiya ifadeyê lı Tırkiyê geleki qelse. Ango bı gelek name û beyanan em çûne ser pırsê. Mesela dı rojnama Cumhuriyetê da qala wan hatiye kırın. Bıli van gelek dazan û nameyên indirek hene ku lı ser rewşa nıviskarên kurd ın. Me gelek caran pırsa nıviskarên kurd pêşda ani. Belki me dıkarıbû bêtır tışt bıkıra. Lê me bêxemi nekıriye.


Paşê dıvê mırov jı bira neke, dı vê projeyê da 30 mılet hebûn ku gelek jı wan xwediyê problemên minoriteya nın. Helbet dıbe ku şertê kurdan jı yê hemûyan gırantır e. Lê yên dın ji hene. Her wısa dıvê ez bıbêjım; hemû ditın û beyanên me xasma lı ser rewşa nıviskaran bû. Em wek rêxıstıneke nıviskaran xwe jı beyanên siyasi dûr dıgrın. Xasma rewşa nıviskaran û azadiya ifadeyê warê helwesta me ye. Lê mebest ew e ku ev proje berdewam be. Em hewl dıdın û hêvi dıkın ku navendên nıviskaran yên nû, yek lı İstenbol-Büyük Ada, ya dın ji lı Rodosê bê vekırın. Jı bo ya Büyük Adayê PEN'a tırki wê cehd bıke. Jı nuha va sinyalên baş tên ku wê bıbe. Û jı bo ya Rodosê, bı riya Wezareta Çandi ya Yûnanistanê jı UNESCO sınyalên pozitif wergırtiye. Em hêvi dıkın ku ew diyalog û nıqaşên ku dı gemiyê da dest pê kırın, dı pêşerojê da ji berdewam bıkın.

Û ez jı nuha va mumkun dıbinım ku em ê bıkarıbın seminereke kurdi pêk binın. Jı bo ku rewşa nıviskarên kurd, çanda kurdi, edebiyata kurdi ya ku lı jiyana mıhacıriyê hatiye mecbûrkırın, dı vê seminerê da bê nıqaşkırın. Dı baweriya mın da ev seminer geleki gırıng e, dıvê em pêk binın. Ango edebiyata kurdi wê bı layiqi dı nav projeya me da cihê xwe bıstine. Em dı pırsa çand û edebiyata kurdi da bêxem û bêdeng ninın.

ROJA NÛ: *Bêşık kurd pê dılxweş dıbın ku derheq pêşerojê da fıkrên we yên baş hene. Lê çand û siyaset bı hev va gırêdayi ne. Qetılkırına kurdan, şewıtandına gund û bajarên wan, valakırına Kurdıstanê, dı eyni wextê da tunekırına kultura wan e...*

P. CURMAN: Ez dızanım, haya mın jê heye. Lê wek organizasyona nıviskaran ditıneke me ya politik

# YAŞAR KEMAL
## jı kete ber êrışên dewletê



Yaşar Kemal

Nıviskarê navdar Yaşar Kemal jı ber hevpeyvina xwe ya dıgel kovara almani DER SPIEGEL bû hedefa êrışên hukumeta tırk û ronakbirên tırk yên şoven.

Lı Tırkiyê tu dıkari hemû cûre xırabiyên adi û siyasi bıki û jı wan ra kıras bıbini.. Xelkê jı wan xırabiyan gelek bezırar ditıye, perişan bûye, betal maye, çûye heddê mırınê ne xem e!. Bes tu tenê behsa pırsa Kurd û mafên wan neke!.. Eger te kır, - gotıneke me Kurda heye, dıbê "xêr û xweşi lı te bari, kevır û kuçık lı mın bari"- kevır û kuçık lı te dıbare. Vê carê kevır û kuçıkên dewleta Tırk li Yaşar Kemal bari...

Yaşar Kemal jı berê va wek insaneki demokrat tê nas kırın, lê nıha bêtır derbari pırsa Kurdi da ditınên xwe aşkera dıke. Demek beri nıha wi beyanek da kovara almani "Der Spiegel". Dı Der Spiegel da, hevpeyvin bı sernıvisa **"Kampanya derewan"** derçû. Baş e Yaşar Kemal dı vê hevpeyvinê da çı gotıbû ku, ewqas êriş hatın serê, DGM dawe lê vekır û kete ber topa dewleta Tırk?

DGM ya generalên kemalist ên şoven, peyva ***"Komara Tırkiyê zulm û zordesti afırand"*** wek tawan (sûc) dit û Yaşar Kemal wek propagandisteki dabeşkarê Tırkiyê êlan kır, bı yasaya "anti-teror"ê wi da mehkemê.

Dı hevpeyvinê da çend peyvên Yaşar Kemal weha nın :

*"Dewleta Tırk, dıxwaze hemû Kurdan bıke parêzkar (korucu) û hevalbendê xwe. Ev taktik jı ali Amerikayê va lı Vietnamê hate çespandın."*

*"Tê gotın ku, Kurd dıxwazın Tırkiyê parçe bıkın! Ev ne rast e. Ev derewa han bı awayeki gelek werımandi û bı kırasên hissi, jı ali dewletê û hevalbendên wê bı xelkê tên qebûl kırın. Ev propaganda bı armanca şıkandına berxwedana gelê Kurd tê ajotın."*

Pışti ewqas iftira û êrişan, Yaşar Kemal dı beyana xwe da mêrxasiya xwe domand û weha bersiv da :

*"Ez van êriş û dıjberiyan bê mane dıbinım, daweya ku DGM 'yê lı mın vekırıye jı xwe ra nakım xem û wan bêmınet dıkım."* Û bersiva xwe bı van peyvên jêr dıdomine : *"Ez bawer ım ku, pırs (pırsa Kurdi) bı axaftın û dan û sıtendınê kare bête çareserkırın. Ev ê ku welatê me kır vi hali, qedexe ne. Pırsa Kurdi bı şer, bı kuştınê nayê helkırın, rêyeke weha şaş e. Pırsa Kurdi bı rêyên aştixwazi û bı hêsani tê çareserkırın. Jı bo gırtına masi, pêwist nake ku tu golê zıwa bıki!"*

Lı gelek welatên cuda û lı Tırkiyê ji dorhêlên demokrat û aştixwaz pıştgıriya Yaşar Kemal dıkın. Yekitiya Nıviskarên Swêdê ji lı dıji êrışên ser Yaşar Kemal dazaneke pressê belav kır û jı serokwezirê Tırkiyê daxwaz kır ku daweya DGM lı hember Yaşar Kemal bê sekınandına.

□

---

:::::> derheq daxwazên kurdan yên teritoryal (erd) da tune. Wek şexıs bêşık ditınên mın hene lı ser vê pırsê. Ez dıkarım bıbêjım wısa ye yan ji weha ye. Lê wek rêxistıneke nıviskaran lı ser pırsên politik em tawır nastinın. Dıgel vê deyn e lı ser me ku em jı bo mafên çandi tawır bıgrın. İcar jı bo mafên çandi yên kurdan em wek Yekitiya Nıviskaran amade ne ku şer bıkın. Û ez ji serokê wê me. Lı mın nakeve ez wek serok dı vê derheqê da ditıneke siyasi pêşkêş bıkım. Dıtınên endamên me geleki jı hev cuda lı ser van tıştan.


Ez fehm dıkım, dema ku gelek jı kurdan bı hewldanên bûyi kêm bıbinın û jê ne razi bın. Dema pırsa kurdan bı serê xwe neyê behs kırın, weki dın çı bê gotın bê mane ye jı bo wan. Lê gereke pırsa kurdan dı nav pırsên dın da bı wan ra bê hılgırtın û dı warê navnetewi da bı pıştgıriyeke xurt bê çareserkırın. Yani bı awaki militani, jı ali hın grûbên bıçûk va û bı sloganan bê parastın wê zêde feydê nebine. Loma dıvê jı ali kurdan va ji bı nêrineke fıre lı pırsê bê mêze kırın.


ROJA NÛ: *Lê YNS dıkare insiyatif bıgre û bı rêxistınên nıviskarên welatên dın ra tevayi rewşa kultura kurdan têxe rojeva UNESCO. Hûn vê dıkarın bıkın?..*

P. CURMAN: Belê em dıkarın. Dı serweriya UNESCO da, jı komisyona swêdi nûnerek heye. Em ê jı bo vi tışti hewl bıdın. Wek mın berê ji got dı bernama me da parastına mafên çanda kurdi heye û em hina lı destpêkê ne..

## Encama lêkolineke nû:

# Berazê kûvi ji cara pêşin lı KURDISTANÊ hatiye kedikırın






*Hestûyên berazan yên 10 000 sal kevn lı Kurdıstanê hatın ditın. Ev nişan dıde ku pêşiyên me beri ku derbasi jiyana çandıniyê bıbın, beraz xwedi kırıne.*

**Berazên kûvi 10.000 sal berê hatıne kedikırın**

Arkeologan lı bılındcihên dorhêla Hallan Cemi (lı nexşeyê bınıhêre) hestûyê berazan derxıst meydanê. Derket holê ku, emrê hestûyan 10000 sal e.

Heta nıha dıhate bawerkırın û gotın ku, heywanên kedikıri yên pêşin mih û bızın ın. Lêkolinên ku hatıne kırın ji, tarixa kedikırına wan dıgıhand heta 8 - 9 hezar sal berê. Lê hestûyên berazan, ditın û baweriyên heyi serûbın kır, munaqeşeyeke nû bı xwe ra ani pêş.


Lı gor arkeologan, beraz yekemin heywanê kedikıri yê mala bûye û kedikırına wan hezar sal beri kedikırına mih û bızınan dest pê kırıye. Lê mıxabın lı cihê ku hestûyên berazan hatıne derxıstın, tu tene yan ji zad nehatıye ditın. Ev rewş ji, bı xwe ra munaqeşeyeke dın aniye. Ango baweri ew bû ku, çandıni û xwedikırına heywanan dı eyni serdemê da dest pê kırıbe. Lê nıha ev baweri ji serûbın dıbe û arkeolog bı ditınek nû dertên pêş. Ditına nû ji ev e: Çandıni lı Rojhılata Navin pıştra dest pê kırıye. Herçıqas çandıni fıkra berdana jiyana koçeri û bı cihbûnê bıde merıv ji, pıştı ditına hestûyên berazan, kevınbûna wi û hipotezên nû ev ditın aktualiteta xwe wında dıke. Ev bermahiyên nûditi nişan dıdın, demên ku nêçirvani û berevkariya mêweyan xırab dıçe, xwedikırına berazan baweriyek

dıde qewmên çiyayi yên vi welati da ku ew derbasi jiyana bınecihi bıbın. hestûyê berazan ên ku lı Hallan Cemi hatıne ditın, nişan dıdın ku beraz ên kedikıri bûne. Ispat ev e ku, dıranê kursi yê berazên kedikıri jı yê berazên kûvi bıçûktır bûne. Tışteki balkêş ê dın ji, pıraniya hestûyên ku hatıne derxıstın ên berazên nêr bûne. Ev ji nişan dıde, dema ku berazên mê jı bo zayinê hatıne veqetandın û xwedikırın, berazên nêr hatıne serjêkırın.

Disa lı gor agahdariyên lêkolinvanan, xwedikırına berazan jı bo cıvatên nêçirvan û berevkar, ên ku jı koçeriyê derbasi jiyana bınecihi bûne, lêhati ye. Kedikırına berazên kûvi gelek hêsan e û jı bo xwedikırına wan zêde tışt nayê xwestın. Dı eyni wextê da beraz, pıraniya xurekan dıke goşt û bı vê xusûsiyeta xwe jı mih û çêlekan zêtır bı ber e.

Gengeşiyên nû lı ser

# Keştiya Nuh..



Dı sala 1994'an da lı dorhêla çiyayê Araratê (Agırı) ango 27 km bı ali bakûrê wi da zınar an ji latek hate ditın. Ev lat wek jı wêne ji tê xuyan, dı forma keştiyekê da ye. Dırêjahiya wi 157 m. fırehiya wi ji 42 metre ye. Cih bı xwe 2000 m. raseri deryayê dıkeve.


Zınarê ku dı forma keştiyê da ye, jı ali lêkolinvanên Emrikani hate ditın. Lı gor agahdariya lêkolinvanên Emrikani, cih û pivanên zınarê wek keşti, pır nêzi çiroka Incilê ye. Ne tenê pivanên keştiyê, her wısa navê bajareki û newalekevê hêlê ji, vê ditınê xurt dıke. Navê bajarê vê hêlê, dı wergera xwe ya Ingılizi da vê maneyê dıde: "Qıjıka welat" an ji "Qıjıka rûyê erdê". Dı navbera navê vi bajari û qıjıka ku Nuh jı keştiyê fırandıbû da pêwendi tête danin. Disa lı vê hêlê bı navê "Navçeya Heştan" an ji "warê Heştan" cihek heye. Ev navê han ji weha tê şırovekırın: Lı gor çiroka Incilê, dema ku keştiya Nuh dertê rûyê erdê û lı wê derê dıçıkıle, jı tofanê heşt kes dıfılıtın. Jı ber çirokê ji, dı navbera navê vê newalê û heşt kesan da têkıliyek tête danin.

Lı gor agahdariyê, dı Incilê da dırêjahiya keştiyê 300 cubit (1) e. Her cubitek, teqriben 50 cm ye. Ev ji tê wê manê ku, dırêjahi 150 metre hatiye destnişan kırın. Saloxiya Incilê, fırehiya keştiyê ji 26 metre nişan dıde. Ev hejmar ji, jı 42 metre ne pır dûr e lı gor hın arkeologan.

*Çavkani: "Illustrerad Vetenskap, hejmar 10 û 12, 1994.*

**Têbini :**

*(1) Cubit : Termeke pivanê ye. Dırêjahiya jı enişkê heta serê tıliya ortê ye.*



Bıha: 15 Skr